Di derbarê penabertîyê da, hin nêrînên xweser.

# Penabertî

## Ji Rê Derketin

Azadê Araratî

# Naverok


(Ji Rê Derketin) ........ 3

Pênase ........ 3

**Kilan** ........ 6

**Êl** ........ 9

**Dagirkerî Nabe Penabertî** ........ 17

**Hîcret** ........ 18

**Serdema PZ Heta 1.500î** ........ 24

Serdema Lêronbûn (Ronesans) û Sermayedarî ........ 25

Kifşkirina Parzemîna Efrîka, Hindistan û Parzemîna Amerîkayê ........ 26

Li Kurdistanê 1.800î û Şûnda ........ 43

Serhildana Babanzadeyan ........ 45

Serhildana Bedirxanîyan ........ 46

Serhildana Rewandiz ........ 48

Dema Şoreşa Hemdem ........ 50

Rêwîtîya Ber Bi Ewropa Ve ........ 50

Penabertîya Partîyên Sîyasî ........ 55

Koçbertîya Jîngehî (Ekolojî) ........ 57

Erdhej ........ 57

Volkan ........ 60

Bahozên Rûxîner ........................................................ 63
Lehî.......................................................................... 64
Erozyon, Darbirîn, Çolkirin ....................................... 65
Germahîya Zêde ......................................................... 68
Şewatindina Daristanan.............................................. 69
Zuhakirina Çeman ...................................................... 72
Lêkirina Bendavan ..................................................... 75
Divê Çi Bê Kirin ........................................................ 77
Belgeyên ku ji wan sûd hatîye wergirtin............... 80

# Penabertî

## (Ji Rê Derketin)

### Pênase

#### *a) Penaber*

Penaber ev e ku kesek ji hêla hin hêzan ve, bi darê zorê ji cih û warê wî tê rakirin û diçe devereka din. Yan li welatê xwe, di deverekê da bi cih dibe, yan jî diçe dervayî welatê xwe û deverekê bi cih dibe.

Sedema bingehîn ya penabertîyê tundî û şer e. Penaber bi dil û riza xwe dev ji cihê xwe bernade. Şerê di navbera dewletan da, di navbera êl û koman da, di navbera bavik û malbatan da, dibe sedem ku kes, kom yan jî beşeka civakê bi neçarî cihê xwe biterikîne.

Ji ber sedemên aborî jî penabertî tê jîyîn. Desthilatê welatekî, yan jî dagirkerê welatekî, dema aborîya civakî têk bide, kes yan jî kom neçar dibin ku ji cihê xwe rabin û biçin. Ev çûyin ji bo debara rojane ye.

Sedemek din jî ew e ku girse dixwaze bi awayekî ewle bijî. Ji ber ku şer yan jî tundî -di serî da- jîyana zarokan û jinan dixe metirsîyê da. Lewra jî kes yan kom cihekî bi ewle digerin ku lê bimînin û jîyana xwe bi awayekî bi ewle biborînin.

Bi rêbazên taybet jî penabertî tê jîyîn. Dewletek dagirker heke bixwaze deverekê yan jî bi giştî erdnîgarîyekê vala

bike û demografîyê biguherîne, wê demê derb li welatparêzîyê dixe. Jîngeh û nirxên civakê, pêş çavên civakê biçûk tên xistin. Hemû nirxên madî û manewî wekî ku bê nirx bin tên nîşandan. Her kes yan jî komên ku bi vê yekê bandor bibin, bi dilê xwe berê xwe didin dervayî welatê xwe. Dewlet bi rêka rêxistinên xwe yên veşartî, bi rêxistinên salixgirî û bi rêxistinên mafya; yek bi yek yan jî kom bi kom girseyan dikişîne dervayî welat. Bi vî awayî tê xwestin ku erdnîgarî were vala kirin û ji nû ve ji hêla girseyên din ve were dagirtin. Ev jî dibe sedem ku demografî were guhertin.

Penabertî gorî serdemên dîrokê reng diguhere. Lewra penabertîya destpêkê û yê sedsala 20em û 21em naşibin hev û du. Ji bo çêtir em serwext bibin, em dê qonax bi qonax mijarê bigirin dest. Ber bi dawîya pirtûkê ve jî em dê bala xwe bidin ser serdema me.

### *b) Koçber*

Ew kes yan jî komên ku ji ber hin sedeman, ji cih û warê xwe radibin û diçin devereka din, koçber in. Koçberî herdemî ye. Ji ber ku sedemên xwezayî hene, koçberî heye û her ku li ser xwezayê kiryar hebin dê zêdetir koçberî têkeve rojeva mirovahîyê.

Di dinyaya me ya îroyîn da, divê pîlansazî û amadekarîyên giştî werin kirin. Ji ber ku sînorên koçberîyê fireh bûne. Berê di navbera hereman da koçberî dihat kirin. Lê belê, di serdema me da, ji parzemînekê heta parzemîneka din koçberî heye. Lewra divê amadekarî hebin.

Di zimanê me da, di derbarê penaber û koçberan da, gelek têgih hene. Ji bo di pirtûkê da, gengeşeya têgihan dernekeve, ez dê 2 têgehan bikar bînim. Yek ji wan penaber û penabertî ye. Ya din jî koçber û koçberî ye. Li gorî Wîkîferhengê, têgihên din yên ku hene jî ev in: mihacir, miltecî, sirgun, xerîbî, xurbet, mişextî, awaretî, derbiderî, biyanistan, dûrwelatî, dîyaspora.

## Kilan

Gerdûna me sirrî û nepenî ye. Di heman demê da, rewşedar e. Di galaksîya me da, her tişt, dora rojê, bi awayekî rewşedar dizivire. Em dema ku kêmek xwe berdidin nava fîzya kuantumê (quantum) mat û metel dibin. Heman hîsan, dema em parêzname û dahûrînên Rêber Apo dixwînin, dijîn. Wekî din kêm tişt hene ku mejîyê me ser û bin dike. Ev jî dihêle ku hîn baştir, em serwextî rastîyan bibin.

Hin tişt, di derbarê dîroka gerdûnê da zelal û ronî ne. Lê belê, gelek tişt jî hene ku sirrîyeta xwe diparêze. Ji ber ku gerdûn bi herdemî di nav guhertin û veguhertinê da ye, em dê tu carî nikaribin rastîyan teqez bizanibin. Bi guhertin û veguhertinê ra rastî jî diguherin. Lewra, dê lêgerîn û lêkolîn hebe, lê belê serwextbûneka ji sedî sed jî dê çê nebe.  Dema em rastîyan bînin ziman, divê van rastîyên gerdûnê berçav bigirin. Hekena em dê têkevin nav qalibên hişk. Em dê bibin serhişk û dogmatîk. Pêdepêde em dê paş bikevin.

Li gorî zanista îroj, her tişt bi teqîna mezin yanî bîg bengê (big bang) dest pê kir.[1] Paşê gerdûn dest bi rêwîtîya xwe dike. Galaksîya me, di navê da, atmosfer û dinyaya me, çêdibe. Bi demê ra jî tim diguhere.

Gorî vê zanînê, li ser rûyê erdê zindî çêdibin. Pê ve girêdayî, destpêka mirovên îroj heye. Mirov di nava

---

[1] *Ez bixwe bi vê dîtin û teorîyê bawer nakim. Sirîyeta çêbûna gerdûnê hîna jî heye. Misoger nayê zanîn bê ka Bîg Beng bi rastî çê bûye yan na!*

demeka dirêj da veguherîye û teşe û zanîna xwe ya îroj girtîye. Li gorî mejîyê destçêkirî ev dîrok bi kurtasî wiha pênase dibe.

***Dîroka mirovahîyê****: Vegotina rabirdûya mirovahîyê ye ku dîroka mirovahîyê bi lêkolînên arkeolojîk, antropolojîk, genetîk, zimannasîyê û piştî afirandina nivîsandinê bi jêderên pileya yekem û yên duyem têdigihijin. Berîya dîroka nivîskî ya mirovahîyê, pêşdîrok hebû ku bi* ***Serdema Paleolîtîkê*** *(serdema kevirî ya kevin) dest pê kirîye û heta* ***Serdema Neolîtîkê*** *(serdema kevirî ya nû) hatîye. Neolîtîk, Şoreşa Çandinîyê, di navbera salên* ***10.000 û 5.000 BZ*** *da, li* ***Kevana Zêrîn*** *dest pê dike.*

*Di vê serdemê da mirov bi awayekî bi pergal dest bi çandinîya nebatan û xwedî kirina ajalan dikin. Bi pêşveketina çandinîyê ra, piranîya mirovan gav bi gav ji jîyana koçerîyê derbasî jîyanek niştecîhî dibin û dest bi cotkarîyê dikin. Ewlehîya ku bi têkildarîya berhemdarîya zêde ya ku bi cotkarîyê hate peyda kirin, bû sedem ku civatê ber bi yekeyên mezintir ve zêde bibin û bi pêşveçûnên di veguhestinê da zêde bûn. Demên pêşdîrokî û di yên dîrokî da, mirov her gav hewce bûn ku nêzî çavkanîyên pê bawer ên ava vexwarinê bin. Mirov di salên* ***4.000 BZ*** *da li* ***Îranê****, li* ***Mezopotamyayê****, li gelîyê* ***Çemê Indûsê*** *li parzemîna* ***Hindistanê****, li peravên* ***Nîlê*** *yên* ***Misrê*** *û li peravên* ***Çemên Çînê****, bi cih bûne.*

***Serdema Paleolîtîk:*** *Bi bikaranîna amûrên homînîd dest pê kirîye. Homînîd, wekî* ***Homo Erectus****, bi hezar salan amûrên dar û kevir ên*

*hêsan bikar anîne, lê her ku dem pêş ve diçû, amûr pir safîtir û tevlihevtir dibin. Dibe ku **18 milyon sal berê** dest bi bikaranîna agirê kirîye. Lê bêguman e ku mirovan **500.000 sal berê** ji bo germê û çêkirina xwarinê dest bi bikaranîna agirê kirine. Nîşaneyên vegotina hunerî ya destpêkê, di awayên tabloyên şikeftan û peykerên ku ji fîl, kevir û hestî hatine çêkirin da têne dîtin, ku tê wateya rengek giyanî; bi gelemperî wekî anîmîzm yan jî wekî şamanîzmê tê şîrovekirin.*

*Wekî ku tê zanîn, dema kilanan demeka herî dirêj e. Mirovahî herî dirêj di dema kilanan da jîyaye. Di vê demê da têgihên cih û war tune ne. Komên mirovan, di nava xwezayê da gerok in. Mirov di herêmeka dîyarkirî da nînin. Mirov cih û warên ku karibin lê bimînin û bijîn digerîyan. Mirov xwe bi herêmekê ve girê nadin. Ev teşeya komikên mirovan ya wê demê ye.*

## Êl

Li gorî zanîna ku herî dawî em têgihiştine, li Rihayê 12 hezar sal berê, teşeya êlan heye. Di vê demê da, perestgeh hene. Perestgeha herî navdar û tê zanîn Girêmirazan e. Girêmirazan dikeve gundê Xirabreşkê. Girêmirazan pêderxistinî 12 km dûrî Riha ye. Di wê demê da, êl têne gel hev û du. Dibe ku cara yekem be ku komikên mirovan di cihekî da bicih dibin. Lê belê, ev cihbûn ne herdemî ye. Hin demên salê, êl têne gel hev û du. Pevguhertina kel û pelan heye. Bîr û bawerî heye. Lidarxistina şahîyan heye. Bi awayekî coş û peroş, bi hev û du ra dem derbaskirin heye. Kultur û rê û resmeka xurt heye. Dibe ku cara yekem, komikên mirovan, ji bo xwe cihekî taybet ava dikin.

Dikarim bibêjim ku ev dibe destpêka welatparêzîyê. Cara destpêkê kom û komikên mirovan xwe bi cihekî ve girêdayî dibînin. Girîngîya erdnîgarîyê zêdetir berbiçav dibe. Avahî lêkirin û wan avahîyan pîroz dîtin heye. Ev di cîhana hizir û hestên mirovan da şoreş e. Pîrozdîtina roj û li gorî teşeya roj girover lêkirina cihan heye. Dîlan û semaha destpêkê jî mîna teşeya roj girover e. Ev heta îroj jî her wisa ye. Lewra Rêber Apoyî sala 1986an da, di kongreya sêyem ya PKKê da got: ***"Em di dîrokê da, dîrok jî di roja me da veşartî ye***". Yanî ew roj û îroj bi hev û du ve girêdayî ye. Qasî ku em serwext dibin, di wê demê da, di navbera êl yan jî koman da, tu şer tune ye. Dibe ku tund û tûjî hebe lê hêzên leşkerî yên bi rêxistinkirî û pispor û şer tune ne.

Qonaxeka girîng ya civakîbûnê, serdema Girêmirazan e. Lê belê, divê were zanîn ku hîna dîrok nepenî û sirrîyeta xwe diparêze û em yekser negihiştine rastîyên wê demê. Ji ber ku ***Kilaus Şimît***[2] Dibêje: Agahîyên me di derbarê Girêmirazan da, ji sedî yek in.

Li Mezopotamyayê, li Kevana Zêrîn, Kurdistana me; di gelî û newalan da, mîna bûhara Çîyayên Andok û Cudî, mirovahî bişkivî. Kom û komik anku êl yan jî em bêjin hoz, li gelîyên bi ber û bereket bi cih bûn. Latên verotina

---

[2] ***(Klaus Schmidt** (jdb. 11ê kanûna pêşîn a 1953ş − m. 20ê tîrmeha 2014an) arkeolog û dîroknasekî alman bû ku ji 1996ê heta 2014an li Girêmirazan xebatên kolandinê kirîye.*

*Klaus Schmidt li zanîngehên Erlangen û Heidelbergê û pirotodîrok, hem jî arkeolojîya kilasîk û jeolojî xwendîye. Wî doktoraya xwe di 1983an da li Zanîngeha Heidelbergê di bin rêberîya Harald Hauptmann da qedandîye. Di sala 1995an da bû serokê kolandinên li Girêmirazan li bakurê Kurdistanê. Di sala 2007an da li Zanîngeha Erlangenê bû pirofesorê alîkar.*

*Schmidt ji destpêka 2001ê ve bû referansê arkeolojîya pêşdîrokê ya beşa Rojhilata Navîn ya Enstîtuya Arkeolojîyê ya Almanya.*

*Schmidt di sala 1995an da malekê li Rihayê kirîye û xebatên xwe li vir bi rê ve birîye. Tîma xwe ya arkeologan bi gelemperî di du mehên biharê û du mehên payizê da cihê Girêmirazan kolandine. Di hevpeyvînekê 2011an da, Schmidt texmîn kir ku pêderxistinî ji sedî pêncîyê şûnwar hatibû vedan.*

*Klaus Schmidt bi arkeologa tirk Çiğdem Köksal-Schmidt ra zewicîye. Di 20ê tîrmeha 2014an da dema ku li Almanyayê avjenî dikir, ji ber kirîza dil mirîye.)*

wan hêsan, vegerandin xanîyên yek jûrî. Paşê xanî ava kirin. Hemdemê hev ajalên koyî[3] (kovî, kûvî) hatin kedîkirin. Vedîtina coka avê pir girîng e. Ji çem û newalokan, ava ku diherikî, bi rêka cokan herikandin nav zevîyan. Bi vî awayî, jîyaneka rewşedar[4] hat sazkirin.

Di vê demê da, di bîrdanka mirovan da, hizirandina li ser erdekê niştecihbûn bi cih dibe. Cara yekem e ku ax, av, hewa zêdetir bandorê li kesayet û bedena mirovan dike. Dîyardeyekî rewşedar ya vê demê jî pêşxistin û teşedana ziman e. Ziman jî êdî dibe taybetmendîyeka xweser ya kom û êlan. Di nava ziman da, devokên gundan jî xweser bi pêş dikevin. Ji bo avahîyekê bingeh çi be, ji bo mirovahîyê jî ev dem her wisa bingeh e.

Dibe ku hin civak van rastîyan ji nêzik ve nizanibin. Lê belê, ya rast em bixwe wekî civaka kurd van tiştan dizanin. Ji ber ku hîna jî gundên me yên neolîtîkê hene. Gundên neolîtîkê yên qala wan tê kirin û gundê ku ez bixwe lê ji dayîk bûme, hema bêje wekî hev in. Lewra em ên kurd vê serdemê baştir dizanin. Bi pênaseyeka din, beşekî kurdan hîn jî mîna gundên neolîtîkê di gundên xwe da dijîn. Ev baş e, ji ber ku em bi resen mane. Ne baş e, ji ber ku em di wir da asê mane. Her çiqas beşekî kurdan dewlet damezirandibin û şaristanî bi pêş xistibin jî beşek jî her wekî xwe maye û ew cewhera destpêkê ya mirovbûn û civakbûnê parastîye. Ya girîng ev e ku li ser

---

[3] *Ko çîya ye, bi dimilkî û hewramî. Tîpa î aîdîyet e. Koyî-Kovî tê wateya çîyayî. Nayê wateya wehş, hov û dirinde.*
[4] *Muhteşem*

hîma bi tekuzî hatîye avêtin, bi awayekî hemdem, em xwe ji nû ve saz bikin. Jixwe ya niha tê kirin jî her ev e.

Piştî teşeya gund bi pêş ket, pê ve girêdayî gelheya gundan jî zêde bû. Hizra jîngeheka baş di bîrdanka mirovan da çêdibe. Bi awayekî xurt girêdanî bi erdnîgarîyê ra çêdibe. Bûharê derketina dervayî gundan û payizan jî vegera gundan heye. Êlên ku konan datînin û radikin hene. Ev êlana ji ber ku ajaldarîyê dikin, li gorî demsalan cih diguherin. Li ser xetekê çûn û hatin heye. Gorî ku ji Avestayê em têdigihijin, di dema fîlozof, pêxember û mamosteyê civakê Zerdeşt da, dema hejmara gund zêde bû, gund xwe dike du beş. Beşek ji gund radibe û diçe di cihekî din da bicih dibe. Dema gelhe zêde bû, jîngeh nikaribe wê gelheyê rake û xwedî bike, gundî dikevin pey lêgerînan û hin cihên nû tên dîtin. Li wan cihan jîyan tê sazkirin. Hişê wê demê çiqas jîngehî û civakî ye tê dîtin. Mirovên serdema Modernîteya Kapîtalîst, bajarên bi milyonan pêş xistin. Tê da jîyan kuştin. Mirov bûn mîna morî, cird û mişkan. Hawirdorê tev xirab dikin. Lê, hişmendîya dema gundan û di gundan da jî yê êlan wisa nîne. Jîngehê diparêze û nahêle bêkêr be.

Di wê demê da, cih û war girîng in. Cihbûn girîng e. Girêdanîya ax û ajalan jîyanî ye. Ji gundê xwe, ji jîyana gundên Kurdistanê, ji jîyana koçeran dizanim ku tehda li ajalan nayê kirin. Dema ajalek za, wî digirin û dibin nav lihêfan. Mîna ku zarokê malê be lê tê meyzandin. Wekî zarokan nav li wan tê kirin. Ev asta ekolojîk ya kurdan e. Di bawerîya kurdan da, birîna darên fêkîyan tawan e û

guneh e. Kurd darên fêkîyan û darên ter anku bican jê nakin. Lê belê, ji bo xweyî kirina ajalên xwe, çilo jê dikin. Giha didûrin û radikin ji bo zivistanê. Bi vî awayî ji xwezayê sûd digirin, lê tiştek ji xwezayê tune nakin. Zirarê nagihînin. Di bingeha hizra welat da, ev dîyarde jî heye.

Êdî cih û warbûn girîng e. Pêrepêre li ser gelî, zevî û mêrgan, di navbera êlan da nelihevî çêdibe. Di nava êlan da, dema ku kalik yan jî bav mir, mîrat tê dabeşkirin. Bira bi bira ra pev diçe. Dema nifşek çû û yekî din mezin bû, di navbera pismaman da jî nelihevî çêdibe. Ji bo gelîyên bi xêr û ber pevçûn derdikeve. Ji bo mêrgeh û çêregehên zozanan pevçûn derdikeve. Divê were zanîn, heta niha jî ev nelihevîyên ku wê demê hene, di nav kurdan da hîna jî hene. Lê belê,di nava hin civakan da ev pirsgirêkên civakî nemane. Taybet jî civakên ku bajarên mezin ava kirin. Civakên ku pîşesazî bi pêş xistin her wisa ne. Di serdema netewîbûnê da, di êlbûnê da asê mayîn ne xêra me kurdan e. Lê belê, netewîyetê ku hat bi pêşxistin jî jêdera şer rûxandin û malvîranî ye. Lewra baş e ku ew netewîyetê xwe dispêre netewperestîyê di me kurdan da bi pêş neket. Her çiqas bi derengî be jî me Rêber Apoyî **Netewa Demokratîk** bi pêş xist ku teşe û naveroka herî rast a serdema me ye. Me dike yek û di navbera me, gel û netewên din da jî xwîşk û biratîyê bi pêş dixîne.

### *a) Penabertîya Neçar, Ber Bi Çîya, Daristan û Çolteran Ve*

Êlek bi êleka din ra pev biçe, di navbera wan da, dê hevsengîya hêz hebe. Dê hevsengîya şert û şirûtan hebe. Di dema êlan da, rewş her wisa ye. Lê mixabin, dema ku hin gund veguherîn bajaran, rewşa civakî jî guherî. Gund lihember bajaran biçûk man. Êl jî li hember gelheya bajar kêm ma. Ev çîrok 4 hezar sal BZ, bi şaristanîya Ubeytê dest pê dike. Bi şaristanîya Someran kûr dibe. Heta roja me jî her kûr û fireh dibe.

Di dema bajarên destpêkê Ur û Uruk, heta sedsala 21em, bajar tim gundan dimijin. Heke nebû dagir dikin. Vîran dikin. Vî jî hişt ku Modernîteya Sermayedar bê bi pêşxistin.

Şeş hezar salên dawî, ji tevahîya dîroka mirovahîyê ruxînertir e. Şerên ku di navbera dewlet û împaratorîyan da hatine kirin hene. Şerên êlan jî bi hev û du ra hene, ji ber ku cih û mekan girîng e.

Ji bo êlan sînorên wan welatê wan e. Li ser welatê xwe dikarin bijîn. Ji bo dewletan û împaratorîyan jî sînorên wan girîng in. Lê belê, ne ji bo jîyanê, ji bo mijandin û dest danîna ser nirxên êlên niştecih girîng e. Wê demê ev rastî der tê holê ku welatê dewlet û împaratorîyan nîne. Girêdanîya wan bi ax, kultur û rê û resmê ve nîne. Ew tenê desthilatî û xwînmijîya xwe dihizirin. Lê, êl û teşeyên wekî wê, axê yanî erdê ku li ser dijîn ji bo xwe wekî welat dibînin. Li ser erdnîgarîya ku lê dijîn, rayên xwe ber didin nava axê û bi kok dibin. Lewra êl bi kok in.

Kok û binkokê xwe dinasin. Lê belê, dewlet û împaratorî bê kok in. Êl kêm caran tune dibin. Lê, dewlet û împaratorî demkî ne û rojek ji rojan dawî li wan tê.

Di navbera êl û dewlet û împaratorîyan da, şer bi berdewamî heye. Di destpêka damezirandina bajar dewletan da, bajar dewletan êrîşî êlên der û dorê dikirin. Êlên der û dora bajar dewletan jî êrîş dibirin ser bajar dewletan. Di vê demê da, heke êlan karî dewletê, dewlet ji holê radibû. Heke bajar dewletan êrîşî êlan kiriba, êl yan radest dibûn, yan tune dibûn, yan jî ji cihê xwe bar dikirin û diçûn devereka din bi cih dibûn.

Di dema împaratorîyan da, împaratoran sînorên xwe fireh dikirin. Di nava sînorên împaratorîyan da êl jî hene. Ev êlana yan yekser radestî împarator dibûn, yan jî di asta xwe da, di sînorên xwe yên dîyarkirî yan ne dîyarkirî da, bi awayekî xweser dijîyan. Êl di teşeya xwe da ya civakî, xweser û demokrat in. Dewlet û împaratorî navendî ne. Êl piranî bi sinc û wijdan jîyana xwe bi rêk dixin. Dewlet û împaratorî girîngî didin peyman, make qanun û qanunan. Lewra jî bi sinc ve girêdayî urf û edetên êlan tevî kulturê wan mayînde û domdar e. Dewlet û împaratorî her çiqas berdewamê hev bin jî dixetimin û ji holê radibin. Kultur û urf û edet li ser erdnîgarîyekê şîn tê. Lewra jî welat û kultur û huner bi hev ve girêdayî ne. Mînak: Li çîyayên Kurdistanê xanî lê kirin, tifik û dadana agir, bi awayekî hatîye bi pêş xistin. Ev pêşxistin girêdayî derfet û jêderên erdnîgarîyê ye. Lewra şikeft û xanîyên bi kevir hene. Li deştan xanîyên ji kelpîçan hatine lêkirin zêdetir in. Ev xanîyên ku jê ra

tê gotin qubbe, di roja me da jî tên lêkirin. Heke em berê xwe bidin mîmarîya qubbeyan, em dê bibînin ku bi temamî li gor derfetan hatine lêkirin. Di heman demê da, ji bo demsalan jî diguncin. Qubbe havînan hênik, zivistanan jî germ in. Hem ekolojîk in, hem jî li gorî tenduristîya mirovan in. Ev kulturekî bi kok e. Her mirovê ku di van şert û şirûtan da tê dinyayê û dijî, kulturê resen digire û vediguhezîne. Bi vî awayî ax û laşê her mirovekî, bi hev û du ra dikelije. Erdnîgarî û hest û hîs dikevin nav hev û du, dikelijin. Dema mirov ji erdnîgarîya xwe ya resen qut dibe, bê esil û fesil dibe.

Desthilatîya ku bi domdarî şer dike, dest li resenîya êlan jî wer dide. Jîyana wan ser û bin dike. Wan ji kokên wan qut dike. Heke fîzîkî nekuje jî bi vî awayî kultur û hunera wan û wêjeya wan -çi dewkî çi jî bi nivîskî- qels dike. Tevî van kiryaran, dema êl ji cihê xwe rabû, bi komî bar dike û li cihekî nû niştecih dibe. Bi vî awayî êl dikare heta astekî kultur û huner, rê û resmê xwe biparêze. Anku pişaftin û asîmîle nabe. Ji resenîya xwe yekser dûr nakeve.

Ji ber ku ji rayên koka civakî yek jî êl e, heta niha jî bi domdarî heye. Her kom û komikên civakî di wateya modern da jî, kilan û êl in. Bê van kom û komikan civak saz nabe. Netew saz nabe.

## Dagirkerî Nabe Penabertî

### *b) Di Dirêjahîya Dîrokê Da, Belavkarî û Dagirkerî*

Êl hewil nadin ku wekî dewletan sînorên xwe fireh bikin. Dewlet piranî hewil didin sînorên xwe fireh bikin. Di vî warî da, çavbirçî ne. Desthilatên dewletan bi awayekî topizî hewil didin dora xwe fireh bikin. Ji cihê xwe radibin û dixwazin deverên din jî bi cih bibin. Ev nabe penaberî yan jî koçberî. Rojhilata Navîn û di asta dinyayê da mînak gelek in. Toranî, rom, tirkmen yan jî tirk ji cihê xwe yê resen rabûn û hatin heta Anatolya. Bi vî jî qayil nebûn, çûn heta Ewropa, heta Efrîka. Ev ne penaberî û ne jî koçberî ye. Ev yekser dagirkerî û çav berdana erd û axa gelan e. Di dema Modernîteya Sermayedar da, parzemîna Amerîka, Efrîka, Okyanusya, Asya hat dagirkirin. Li van deran kesên ji Ewropa ne bûn xwedî erd. Gelên niştecih û resen anîn ber tunebûnê. Koka gelekan qelandin. Cih guhertina bi vî rengî û xwe bi cih û war kirin, ne xwezayî û civakî ye. Ev dagirkerî û talankarî ye. Di bingeha şerên sedsala 20em û 21em da ev dîyarde heye. Bi vî rengî xwe belavkirina Ewropa hişt ku ew ber bi dij civakîbûnê ve pêş bikevin.

### c) *Birahîm Xelîl*

Birahîm Xelîl ji Rihaya îro ye. Li hember Nemrût serî rakirîye. Dema nekarî pê ra serederî bike, ji neçarî ji cih û warê xwe rabûye. Ev penabertî ye. Birahîm Xelîl tevî êla xwe berê xwe dide dîyarê Kenan. Ji wê demê û şûnda, êla Birahîm Xelîl tevahîya cîhanê belav dibe. Du hezar sal bê war bûn. Dema ku bi war jî bûn, bûn sedemên pirsgirêkan. Lewra di cihê xwe yê resen da mayin girîng e. Hekena mirov rastî gelek pirsgirêkan tê.

Ji ber ku cihû ne xwedî welat bûn, beşekî wan, yanî zengînên wan, girîngî dan sermayeya ne sabit. Girîngî dan zêr, zîv û diravan. Ji ber ku heke koçber jî bûbana, dikarîn sermayeya xwe bi xwe ra hilgirin û bibin. Dîsa ji ber bê welatî, cihûyan tim hewil da ku di nav pergala dewletan da bi bandor bibin. Xwe bi awayekî dixin nava desthilatîyê û hewil didin ku bi bandor bibin. Penabertîya wan ya bi Birahîm Xelîl dest pê kirî, hişt ku ev taybetmendî di wan da werin pêş.

Cihû niha berbelav in. Berbelavbûna wan wekî têgih tê gotin diaspora. Cihûyên diaspora ji hêla hizir û hunerê da jî zîrek in. Hem jêdera bîrdozîyan in, hem jî di sînemayê da bi bandor in. Bindestî û neçarîyên ku dijîn bi sînema tînin ser dîmenderan[5]. Dîsa cihû di wêjeyê da jî bi bandor in. Di berhemên xwe da tim balê dikişînin ser

[5] Şaşe, ekran

perîşanîya cihûyan. Bi vî rengî dikarin hin dewlet û civakan bidin pişt xwe û bi vê rewşê sûdeka baş bigirin.

Ji bo çareserîyê jî divê ew berê xwe bidin civakîbûnê. Hizir û bawerîya netewîyetê bi awayekî ji xwe razî û xwe li ser hemû netewan ra dîtin, aîdê cihutîyê ye. Ew hizir ji wan derket û bû malê gelek netewên din. Her ku cihûyan xwe ser netewan ra dîtin, hin netewan jî xwe ser netewan ra dîtin. Vê jî hişt ku hizra wan li wan vegere û îcar ew bixwe bibin qurbanê vê hizirandinê. Mînaka vî ya herî ber bi çav û tê zanîn netewperestîya Hîtlerê alman e. Ev hizra netewîyetê bû sersebeb ku gelek netew rû bi rûyê komkujîyan werin. Çare jî ev e ku bi Modernîteya Demokratîk Konfederasyonên Demokratîk werin damezirandin. Di navê da Netewên Demokratîk hebin. Bi vê hişmendîyê hem cihû hem jî netew hemû dikarin werin parastin û bi pêş xistin.

### *d) Mihemed Pêxember*

Mihemed Pêxember jî neçarî penabertîyê bûye. PZ sala 622an, Pêxember tevî sehabî û misilmanan neçar dibe ku ji Mekke derkeve û berê xwe bide Medîne. Penabertîyek cuda ye. Ji armancekî ve girêdayî ye. Ji bo bicih kirina armanca xwe ji cihê xwe radibe. Cihê ku çûyê û lê bicih bûye, têkoşîna xwe domandîye. Di nav civaka Medîne da nehelîyaye û tune nebûye.

Rastîyeka wiha jî heye: Her hizir xwe dispêre bîr û bawerîyê. Di encama bîr û bawerîyê da, dema ku hizirandineka nû çêbû, ji bo jîyanî bibe, pêdivî bi civak, mekan û şertên dest dide heye. Hizir dê li kû jîyanî bibe? Lêgerek tê kirin ku kû der dest bide, xwedîyê hizir berê xwe dide wê derê. Wekî ku ji bo bizir zîl bide pêdivî bi ax, av û hewayek dest bide hebe. Ji ber ku bizirin hene li her derê zîl nadin û mezin nabin.

Penabertîya Mihemed Pêxember sînorên welat derbas nekirîye. Penabertîyek li nav welat e. Ji penabertîya xwe sûdekî baş girtîye û ola xwe belav kirîye. Her çiqas îstisna be jî penabertîyên wisa bi sûd jî hene.

### *e) Rêber Apo*

Rêber Apo di heft salîya xwe da dest bi têkoşînê kirîye. Bi awayekî fermî sala 1973an li Ankara ku paytexta Tirkîye ye, dest bi têkoşînê kirîye. Heke Rêbertî tevî koma ku bi rêxistin kir, li Ankara maba nedibû. Lewra piştî civîna Dîkmenê ku li Ankara hat bestin berê xwe da Kurdistanê. Ev jî vegereka ji nû ve ye. Di heman demê da vegera rastî û resenîya xwe ye. Lewra ji bo kom, gel û netewan vegerên bi vî rengî dibin bingeha ji nû ve vejînê.

Di heman demê da, Rêber Apoyî jî ji ber neçarîyê berê xwe daye xerîbîyê. Ev rêwîtî mîna rêwîtîya Pêxember Birahîm Xelîl û ya Pêxember Mihemed e. Rêwîtî yan jî penabertî ne ji bo helandin û ji holê rabûn e. Rêwîtî ji bo xurtkirina doz û serxistina armancê ye. Di dîrokê da bûyerên bi vî rengî kêm in. Ev bûyerên wisa yan jî penabertî, rêveçûna dîrokê diguhere.

Rêber Apo erê bûye penaber, lê ji bo vegereka xurttir û bi encam kar kirîye. Mîna Pêxember Birahîm Xelîl û Mihemed, di şertên pir zehmet da kar kirîye. Rêbertî tim hewil da ku welat rizgar bike û paşê vegere.

Hin partîyên tirkan yên şoreşger jî berê xwe dan Beyrûtê. Daku xwe amade bikin û vegerin Tirkîyeyê. Hin hewildan hebin jî bê encam in. Partî, serek û kadroyên şoreşger yên tirkan ji xerîbîyekê berê xwe dan xerîbîyeka din. Bi vî awayî xwe gihandin Ewropa. Li xerîbîyê jî hatin pişaftin û tune bûn.

Bi vî awayî penabertîya bi armanc ve girêdayî sûdewer e. Lê belê metirsîyên mezin jî di xwe da dihewîne. Metirsî jî ev e ku jîyana penabertîyê mayînde dibe. Di dawîyê da jî li ser erdê penabertîyê helandin çê dibe. Êdî penaber dîrok, kultur, ziman û kevneşopîyên xwe wenda dike. Bê esil û fesil dibe. Di nav civaka ku lê dimîne, dibe pêvek. Tê bikaranîn. Tu caran nikare bibe kirdeya civaka ku tê da dijî.

Rêber Apo van metirsîyan zu dibîne. Tiştên pêwîst dike. Berê koma xwe anku kadroyan dide welat. Hest û rewana welatparêzîyê zindî digire. Di encamê da penabertîya ku ber bi Ewropayê ve hebû, vegerand ji nû ve vegera welat.

Bi demê ra jî bi hezaran ciwan ji welatên Ewropa hatin û xwe gihandin Çîyayên Kurdistanê. Pêrepêre ji welatên Kafkasya û Rusya jî gelek ciwan hatin û xwe tevlî dozê kirin. Ev serkeftinek nedîtî û yekta ye. Keda Rêber Apo tê da dîyar e.

Divê were zanîn: Rêber Apo sala 1982 diçe Bulgaristanê. Sala 1986 jî diçe Almanyaya Rojhilat. Van welatan dibîne. Ji nêzik ve nas dike. Serwextî rewşa cîhanê dibe. Civakparêzîya ku heye ji nêzik ve dibîne. Ew di encamê da dibîne ku bê hêza gel tu tişt nayê serxistin. Penabertîya li welatan û alîkarîya dewletên civakparêz, tu encamê bi xwe ra nayîne. Rêbertî van rastîyan ji nêzîk ve dibîne. Ji ber ku civakparêzîya ku heye, ne zanistî, demokratîk û civakî ye. Ev civakparêzî şêwazeka din yê sermayedarîyê ye. Serwextbûna vê rastîyê hêzê dide

Rêber Apoyî. Lewra jî divê em welatê xwe neterikînin. Welat terikandin mirineka kambax e. Mirineka rewanî ye.

Rêber Apo li penaberîyê 20 salan ma. Pêderxistinî 30 hezar kadro, milîtan û gerîla perwerde kir û şand welat. Kadroyên perwerdekirî şand her cihê ku kurd lê dijîn. Penabertîya ku her çar dewletên dagirker sepandî lê taybet penabertîya ku dewleta tirk sepandî heta astekê bê encam hişt. Kurdên ku li penaberîyê, durî welat dijîn jî piranî ji bo doza welat têdikoşin.

Bi cîhanîbûna doza me da, têkoşîna Rêber Apoyî dîyarîker e. Hekena kurd dê xerîbîyê tune bûbana. Dîsa PKKê pir têkoşîyaye ku kurd di penabertîyê da tune nebin. Kurd rêxistin kirin û bi rêka wan kurdan têkoşîna me giha asteka bilindtir. Dîplomasî û têkilîyên me bi gelan û rêxistinan ra xurttir bûn. Niha kurd her devera dinyayê tên nasîn. Dostên kurdan hene. Şoreşgerên enternasyonalîst hene. Em ji bo wan ew ji bo me kar dikin. Di van karan da, kurdên ku dûrî welat ketine, risteka girîng digerînin. Ev jî bi pêşbînî û bi rêxistinkirina Rêber Apoyî pêkan bûye.

Penabertîya Rêber Apoyî penabertîyeka wisa ye. Hem dişibe ya Birahîm Xehlîl û Mihemed hem jî gelek hêlan ve ji wan cuda ye. Ev ji bo tevahîya gelên cîhanê yên penaberbûyî jî dibe mînakeka baş. Her kes, kom, gelên ku neçarî penaberîyê bûbe, dikare xwe bi awayekî baş bi rêxistin bike. Xwe perwerde bike. Careka din vegere li ser axa bav û kalên xwe. Xwe bi pergal bike û bijî.

## Serdema PZ Heta 1.500î

Ev dem dema feodalan e. Di vê demê da zêdetir împaratorî li ser dinyayê zal in. Bi giranî împaratorîya Roma serdestê dinyaya wê demê ye ku li gorî îro dinyayekî sînordartir e. Împaratorîya Sasanî heye ku li Rojhilata Navîn serdest e. Piştî Împaratorîya Sasanî, derketin û xwe belavkirina îslamîyetê heye. Îslamîyet jî bi qonaxan ra derbas bûye. Yanî desthilatî û navenda wê dest guhertîye.

***Hun û Atîla***: Di vê demê da miletê hun jî derdikevin pêş. Piranî dema ku miletek ji cihê xwe rabû, perperîşan dibe. Lê hunan bi xwîn, dagirkerî, talan û şewitandina gund û bajaran dîrokek din nivîsandine. Dema em belgeyên nivîskî û dîtbarî dinêrin, du nêrîn derdikevin pêş. Tirk bi pesindanî qala hunan û Atîla dikin. Hin ewropî jî berovajîyê vê qala hunan û Atîla dikin. Ev her du nêrîn û destgirtin şaş in. Rastîya dîrokê ranaxe li ber çavan.

Ji ber ku hun wekî gel ji Asyaya Navîn rabûne û heta rojavayê Ewropa çûne. Li ser Deryaya Reş xwe gihandine heta Îtalya û Firansaya îroj. Di navbera Asyaya Navîn û heta Îtalya-Firansa kê dizane ku çiqas komik û kom hebûn. Erê, çiqas komik, kom, gel hebin hemûyan zirar û xusarekî mezin dîtin. Tevî vê yekê, desthilatên hunan -berîya Atîla û di dema Atîla da-zirarek mezin dan hunan. Ji ber ku hunî di şeran da her çiqas xenîmet bi dest xistibin jî gelek ji wan jî hatin kuştin. Li welatên Ewropa komên mirovan bajar bi bajar, gund bi gund axa xwe terikandin û bûn penaber. Ev kêm zêde tê zanîn. Tê nivîsandin û tê vegotin. Lê mixabin, di

navbera Asyaya Navîn û Ewropa da çi bi serê komên mirovan hat? Çi bi gund û bajaran hat? Ev nayê zanîn. Di heman demê da ev neheqîyek mezin e ku li wan mirovan tê kirin.

Di demeka dîrokê da, kesinên zilimkar radibin û tenê bi rijandina xwînê û şewitandina gund û bajaran serwet bi dest dixin. Di encamê da, bi hejmareka nayê zanîn mirov dimirin. Ji cih û warê xwe dibin. Ev di dîroka mirovahîyê da wekî lekeyekî reş e. Di sedsala 20em ya PZ da, di milekê da Împaratorîya Bîzans ya rojhilat û rojava, di milê din da Împaratorîya Hunan, dîrokeka bi xwîn û rûxîner li pey xwe hiştin û çûn.

Heke em bi roja me ya îro ve girê bidin, împaratorên îro wekî DYA pê ve girêdayî NATO, Rusya û Çîn jî dê herin ser sergoya dîrokê û wenda bibin biçin. Di Rojhilata Navîn da, dewletên wekî Tirkîye, Îran û hwd, rojek tê di zilma xwe da dê bifetisin û biçin. Ji ber ku vana tiştekî civakî û çandî li dû xwe nahêlin.

Ez dê vê mijarê zêdetir venekim. Ji ber ku împaratorîya destpêkê ya Akad heta împaratorîya dawî ya DYA, kêm zêde hemû împaratorî dişibin hev.

## Serdema Lêronbûn (Ronesans) û Sermayedarî

Piştî ku pêşengtîya şaristanîyan ji Rojhilata Navîn derbasî Ewropa bû, du hişmendîyên sereke derketin pêş. Ji wana yek hiş û hizirandina ji bo mirovahîyê bû. Vê jî bi awayekî serkeftî xizmeta mirovahîyê kir. Em ji vê

rastîyê ra dibêjin Lêronbûn[6] (Ronesans). Hişmendîya mirovahîyê gavek ber bi pêş ve avêt. Zanist, bîrdozî, çand, huner, wêje û hwd; gavên mezin û ber bi çav hatin avêtin. Ji bo azadîya jinê û jîyana civakî hewildanên mezin hebûn. Bi taybet jî ji alîyê jinên têkoşer ve bedelên giran hatin dayîn. Heta astekê encam hat girtin.

Ya duyem jî ber bi derve ve xwe belavkirina Ewropa ye. Ev xwe belavkirin yan jî dagirkerî jî du şaxên xwe hene. Ji vana yekem belavkarîya hêzên sermeyedar û dewletên wan e. Ya duyem jî kesên ku li Ewropa dijîyan lê perîşan û belengaz bûn, rêya ku dagirker û sermayedaran vedikir, bingeh girtin û çûn xerîbîyê. Ji bo pirtûkê ez dê dagirker û dewletên dagirker bingeh bigirim û binirxînim.

## Kifşkirina Parzemîna Efrîka, Hindistan û Parzemîna Amerîkayê

Tişta ku hêzên Asyaya Navîn anîn ser Rojhilata Navîn, ewropîyan jî anîn ser Parzemîna Efrîka, Hindistan û Parzemîna Amerîkayê. Ji serdema kilan û Şoreşa Gundan cudatir dîrokek hatîye jîyîn. Bi taybet sedsala 15em û şûnda ewropîyan li ser derya û okyanûsan ra xwe gihandin hin deverên cîhanê ku heta wê demê ewropîyan nedizanî. Heta vê demê rêkên çûn û hatinê, rêkên bazirganîyê, rêkên şer û dagirkirinê bi bejahîyê ra bûn. Dema ku bi destê ewropîyan rêkên derya û okyanûsan hatin vedîtin, ji wan ra derfetên nû hatin pêş. Ev derefetên ku ewropîyan bi dest xistin, ji bo pêşxistin û

[6] Di zanist, felsefe, huner, muzîk û hwd da pêşketinên dişibin serdema Şoreşa Gundan bi pêş ketin.

geşkirina jîyana civakan nehat bikaranîn. Ji bo ji hev xistin û belavkirina civakan hat bikar anîn. Sedemên vê yên dîrokî û hişmendîyê hene. Lê belê ev jî ne mijara vê pirtûkê ye. Ya girîng ev e ku divê em bizanibin ku bi destê hêzên ewropî ve dîrokek dij mirovbûnê hat pêşxistin. Heta serdema me, yanî heta sedsala 21em jî bi giştî mirovahî êşa encama vê hişmendîya ewropîyan dikişîne.

### a. *Parzemîna Efrîka*

Kifşkirina Efrîkayê ji alîyê ewropîyan ve, xwedî dîrokek kevnare û girîng e. Ev piroses, ku ji serdema kevnare ve dest pê kir, bi serfiraziyên geştiyarî, dagirkirinên kolonyalî û guhertinên mezin li seranserê parzemînê ve hatiye nasîn. Ji ber vê yekê, ev pirs dikare bi gelek alîyan ve were şîrovekirin. Heke me bi başî şîrove kir, em dikarin pirsgirêkên roja me ya îro jî binasin û ji van pirsgirêkan ra jî çareserî bibînin. Em dikarin bi awayekî baş, dahatîya xwe ava bikin. Em dikarin Rojhilata Navîn jî bigirin dest û ji qeyran û alozîyan rizgar bikin.

Di serdema Romayê da, ewropîyan cara yekem bi rêya Împaratorîya Romayê, ku parçeyên mezin ên bakurê Efrîka û piranîya rojavayê Ewropayê kontrol dikir, ew li Efrîkayê çalak bûn. Romayî ku di hunerên hiqûqa piratîkî da serketî bûn û xwedî artêşek mezin bûn, pîlansazîya hukûmetê li ser vî parzemînê dixistin merîyetê.

Di serdema Osmanîyan da ku ji sala 1299an ve heta 1922an berdewam kir, ewropîyan bi rêya Osmanîyan ku

herêma Efrîkayê yê wekî Mîsir kontrol dikir, li Efrîkayê çalak bûn. Di vê demê da, ewropîyan, bi taybetî dewletên wekî Îngiltere û Firansa, bi rêya siyaseta kolonyalîzmê û pêşniyarên siyasî yên ku bi Osmanîyan ra kirin, bandorên xwe li ser Efrîkayê zêde kirin.

Di serdema nû da, bi taybetî di serdema kolonyalîzmê da, ewropîyan bi rêya dagirkirinê û avakirina kolonîyan li seranserê Efrîkayê, bandorên xwe li ser vî parzemînê zêde kirin. Ew ji bo bi dest xistina çavkanîyên xwezayî, wekî zêr û elmas û ji bo kontrolkirina rêyên bazirganî, bi taybetî li ser Deryaya Navîn, Efrîkayê kifş kirin. Ev piroses ku ji sala 1884an heta sala 1885an ve, bi Konferansa Berlînê dest pê kir û heta dawîya serdema kolonyalîzmê berdewam kir, gelek guhertinên mezin û rûxîner li ser civakên Efrîkayê û dîroka wê anî.

Di dawîya serdema kolonyalîzmê da, bi serfiraziyên berxwedanê û şoreşên serbixweyî yên gelên Efrîkayê, ewropîyan dest ji kontrola xwe li ser vî parzemînê berdan. Ev proses, ku di navbera salên 1950î û 1970î da berdewam kir, bi serfirazîyên serbixweyî û avakirina dewletên nû ve hatîye nasîn.

Di dîroka mirovahiyê da, kifşkirina Efrîkayê ji alîyê ewropîyan ve, gelek bandorên negatîf li ser civakên Efrîkayê û dahatîya wê heye. Ev bandorên negatîf ku ji alîyê geştiyarî, kolonyalîzm û serfiraziyên serbixweyî ve tên nîşandan, hîn jî di dahatîya Efrîkayê da bandorên xwe nîşan didin. Hîn jî di navbera dewletên dagirker yên Ewropa û Parzemîna Efrîkayê da pirsgirêkên mezin hene.

Ji ber ku Efrîka hîn jî ji alîyê Ewropîyan vê tê mêtin. Hîn jî sedemên şerên ku li Parzemîna Efrîka dibin, ji sedeman ra sedemê yekem dîsa ewropî ne.

1. ***Xwezaya Civakî***: Bi destwerdana biyanîyan, civaka Efrîkayê ji xwezabûna xwe derketîye. Li gorî zanista sedsala 21em, Efrîka cihekî wisa ye ku cara yekem mirov lê bi pêş ketine. Di encama peresana[7] sed milyonan salan, mirov gihiştin serdema me. Jêder Efrîka ye. Lewra girîng e. Li Efrîkayê heta serdema me jî civaka xwezayî wekî komik û komên mirovan hene. Divê kom, gel û netewên Efrîka bi baldarî werin şopandin û divê mirovahî xwedî li wan derkeve. Ne ku wan bi tunebûnê ra rû bi rû bihêle.
   Ji komikekî heta civakekî berfereh, heke bi hemdê xwe xwe biguherîne baş e. Heke bi destên derva -bi taybet bi destê dagirker û kujeran ve-were guhertin, ew çi komikek yan jî civakek berbelav be, dê taybetmendîyên xwe yên bingehîn ji dest bide. Di ser da jî komkujî û penabertî hebe, êdî li holê bi navê civakîbûnê tiştek namîne. Rewşa civaka Parzemîna Efrîkaya îro, vî tiştî bi başî radixe ber çavan. Nezanî, birçîtî, mayina dervayî serdemê, serî tewandin, li hember hev çavsor û hwd, di dirêjahîya dîrokê da gav bi gav hatine bi pêş xistin. Bi taybet ji hêla ewropîyan û amerîkîyan ve. Tawan yê van

[7] Evrim: tr

netewan e. Lê belê xwe rizgar û azad kirin, divê bi destên efrîkîyan bixwe be.
Mixabin dema ku kolonyalîst ketin Parzemîna Efrîka, hişmendîya xwe ya desthilat jî bi xwe ra birin û xistin nava civakên Parzemîna Efrîkayê. Pêrepêre di nava efrîkîyan da jî desthilatî bi pêş dikeve. Serekên êlan bûn desthilatên wan. Ev serek û pêşengên civakî ji civaka xwe cuda bûn. Bi kolonyalîstên ewropî ra ketin nava hevkarîyê. Di destê kolonyalîstan da bûn mîna pêlîstokên zarokan. Kolonyalîstan bi rêka van serekên cihî, êlên hereman bera hev dan. Çandeka wisa di nav efrîkîyan da çandin. Ev jî wekî hişmendî heta sedsala 21em bi xurtî berdewam e. Hin serek û şoreşger dem bi dem derketibin jî guhertin û veguhertinên pêwîst nedikarîn bikin. Ji van serokan yek jî **Patrice Lumumbayê** heval û hogirê **Ernesto Che Guevara ye.** Tevî Ernesto Che Givara her çiqas xwest civakê biguherîne jî ne ew ne jî Che serkeftî nebûn. Di dawîyê da Che Kongo terikand û Patrice Lumumba jî rastî reşkujîyê hat.

2. ***Veguhestina Dîn***: Dîn bi rêya misyoneran[8] hatîye veguhestin. Di dema kolonyalîstîya Ewropa da, bi rêya misyoneran dînê xirîstîyantî jî veguhestin Parzemîna Efrîka. Bawerîyên cihî bi vî awayî li gelek deveran hatin rakirin. Tevî dagirkerîya

[8] Misyoner: Gerokên ku armanca gera wan belavkirina dînekî ye. (Bi taybetî filetî-xirîstîyantî.)

erdnîgarî û civakî, mejîyê gelên efrîkayî jî hatîye pişaftinkirin.
Misyoneran ji bo bawerî pê anînê, rêbazên cur bi cur bikar anîne. Xwe wisa nîşan dane ku ew xwedî bi hêzên ser xweza ra ne. Xwedê hêzê dide wan. Lewra efrîkayî nikarin bi wan. Wisa dane bawerkirin ku mirovê sipî serdestê wan e. Teknolojî û bi rêya teknolojî fêlbazîyên ku kirine, niştecihan dane bawerkirin ku ew ne mirovên asayî ne.
Pêrepêre dêr hatine lêkirin. Dest bi perwerdeyê hatîye kirin. Paşê bi hezaran mirov ji welatên Ewropa birin û bi gelek deverên Parzemîna Efrîkayê bi cih kirin. Dema ku misyonerên ewropayî çûn Parzemîna Efrîkayê, li Ewropa xirîstîyantî dabeşî mezheban bûbû. Vêca her misyonerekî li gorî mezheba xwe dîn vediguhest. Nakokî û nelihevîyên mezhebî yên ku Parzemîna Ewropa hebû, bi rêka van misyoneran derbasî Parzemîna Efrîka jî bû. Tevî dabeşkirina erdnîgarî û civakî, ji hêla dîn û mezhebên wê da jî civak hatîye dabeşkirin.
Jixwe li bakurê Parzemîna Efrîka jî misilmantî berbelav e. Bi vî awayî du dînên mezin li Parzemîna Efrîka berbelav in. Lê mixabin van her du dînan jî şûna aramî û ahengê, mirovên Parzemîna Efrîka tev kirin dijminên hev. Bi vê yekê hêzên derekî ji kû derê dibin bila bibin, serdestîya xwe li ser mirovên Parzemîna Efrîka didomînin.

3. ***Destwerdana Li Ser Çandê***: Li Parzemîna Efrîka, di dirêjahîya bi milyonan salan da, çandeka civakî bi pêş ket. Vê çandê bi hezaran salan bajar nedinasîn. Di cih û warên dest dide da bi awayekî xweber û kominal dijîyan. Li gor rewşa avhewayê cih diguhertin. Koçberîyek di nava xwezaya xwe da hebû. Ev jî asayîye ku hebe. Mirovên Parzemîna Efrîka tu caran birçîbûn û bêkarî nejîyan. Ji ber ku xweza mîna dayîkê ye. Têra mirovan û zîndeweran dike. Di xwezayê da, hişkesalî û erdhej hene û dê hebin. Pêşîya vê nayê girtin. Lê ev rewş nabe sersebeb ku tevkujî çêbibin. Çand û jîyana civakî her tê parastin. Di rastîya gerdûna me da, filaketên xwezayî jî xwezayî ne. Ji ber ku gerdûn kêlî bi kêlî di nava guhertin û veguhertinê da ye. Tiştine dirûxin û tiştine din jî peyda dibin. Tiştin jî hene ku vediguherin. Teşe û rengên nû digirin. Lewra gerdûn û xwezaya em di nav da dijîn rewşedar[9] e. Ji vê rastîyê gazinc nayê kirin. Lêbelê bi destê mirov ku bi awayekî ne xwezayî dest li civak û xwezayê hat werdan, hingî pirsgirêk der tên. Ev jî dibe sedema rûxandina xwezayî û civakî. Erê, di xwezayê da rûxînerî heye. Di civak û xwezayê da, bi destê mirov rûxandin ne rûxandineka xwewzayî û ji ber xwe ve ye. Lewra jî zirardar e. Di heman demê da tuneker e.

[9] Muhteşem

Tişta li serê Parzemîna Efrîka anîn her rûxînerî û tunekirin e. Ewropîyan bi awayekî çeloxwar çanda xwe veguhestin nava civakên Parzemîna Efrîka. Bajar û di bajaran da avahîyên bi beton, çanda resen ku di gundan da hebû, ji holê rakir. Cil û berg û xemla mirovan hat guhertin. Rê û resmên êlan di gelek deveran da yekcarî ji holê rabû. Muzîk, dans, rîtuel qaşo hatin modernkirin. Ev jî bi awayê çandê ji holê rakirina civakan e. Lewra jî li Parzemîna Efrîka tevî tevkujîyên fîzîkî tevkujîyên çand û hunerê jî hatine kirin.
***Ziman, Xwendin û Nivîsîn***: Ji bê zimanî derbasbûna bi ziman axavtin, dîyardeya yekta ya dîroka mirovahîyê ye. Di guhertina jîyana mirovan da, ji sedeman ra yek jî ev e ku bi ziman mirovan teşe û cewhera jîyana xwe ya bi sed milyonan salan guhertine. Efrîkî xwedî hin êlên sereke ne. Zimanê ku êlên sereke pê diaxivin jî dibe zimanê sereke yê vê parzemînê.
Heke Parzemîna Efrîka bi xwezaya xwe maba. Li gorî xwezaya xwe xwe guhertiba û veguhertiba, dê rewşa îroyîn ya parzemînê cuda ba. Mixabin ji milê ziman ve jî dest li parzemînê hatîye werdan. Bi dagirkerîya ewropayîyan ra zimanê îngilîzî, firansî û hwd derbasî nava gelên Parzemîna Efrîka bûye. Li kêleka fêrkirina dîn, ziman jî hatîye fêrkirin. Piştî şerê parve kirinê yê cîhanî yê 2em, hin dewlet bi sînorên sîyasî hatin damezirandin. Hin ji van dewletan jî girîngî neda zimanê xwe yê resen û zimanê derekî bikar anîn.

Hin serekên êl û yên civakî jî li ser heman ferasetê bûn ku zimanê dagirkeran bikar anîn. Bi vî awayî kiryarên dagirkeran yên bi sedan salan mayînde bûne. Êdî bi awayekî xweber penabertî heye. Şer heye. Çand û huner û ziman ji dest dayîn heye. Aşa ku digere jê xirabî dibarin. Lewra heta ku şoreşekî bingehîn û redîkal nebe, Parzemîna Efrîka nayê ser hemdê xwe. Bê guman mebesta min ji şoreşê: Guhertina bîrdank, hişmendî û her dîyardeyê ku bi pê ve girêdayî ye. Hekena Parzemîna Efrîka di destê dagirker û kolonyalîstan da, bi şêwaz û sîyasetên nûjenkirî dê her tim penabertî û zilmê bijî. Dê tim were mêtin û were bikaranîn. Hêvî ev e ku di serdema Modernîteya Demokratîk da gelên Parzemîna Efrîka xwe tevlî Konfederasyona Gelên Cîhanê bike. Bi destê xwe xwe bigihijîne aştî û aramîyê.

4. ***Sipartina Bindestîyê***: Di xwezaya civakê da, serdest û bindest tune ye. Eva ku heye, pêşengtîya jixweber e. Çi kom be çi jî girseya gund be, hin kes derdikevin pêş û ji girseya xwe ra pêşengtîyê dikin. Ev kesana jî xwedî karîn in. Dikarin sergêrîyê bikin. Mîna ku sergovend serê govendê digerîne, wisa. Peyva koordîne ketîye zimanê me lê kurdîya wê sergêr e. Heke kesek be. Ji kesekî zêdetir be ew dibe sergêrî. Sergêr mîna sergovend serî digire û girseyê bi rê ve dibe. Di zimanê me da pergalek xweş û tekuz heye. Lê belê ji ber ku em jî têra xwe hatine pişaft kirin, me gelek tiştên xwe yê xweş ji dest berda ne.

Lewra bi kurtî: Di kurdîyê da peyva KEY heye. Peyveka mîna joker e. Gelek peyv û têgih jê zêde bûne. Li gorî vê key: Melîk, kiral, paşa ye. Keybanû: Melîke, kiralîçe ye. Keye malbat e. Keynek keçik e. Keyeker ev kesa ku hamarat e. Keyber derîyê hewşa malê ye. Keya mixtarê gund yan jî di bajar da yê taxê ye. Pergala civakî ya xwezayî bi vî awayî rengê xwe daye ziman. Bi pêderxistinî mirov dikare têbigihîje ku civaka Parzemîna Efrîka jî her wisa ye. Ji ber ku pêşengên êlên xwezayî ku di nav xwezayê da dijîn, em berê xwe didin wan êlan û dibînin ku pêşengên wan ne xwedî sitratejîyekî cuda ne. Di nav hev da ne. Pêşeng zêdetir çalak e û xwedî ked e. Zêdetir li hember girseyê berpirsîyar e. Piştî ki misyoner ketin nava Parzemîna Efrîkayê, hişmendîya xwe jî di nav civakê da bi cih kirin. Wisa kirin ku beşekî mezin yê civakê ji xwezabûna xwe derkeve. Pêşengên xwezayî yên civakê serdestî û bindestî ji misyoneran fêr bûn. Destpêkê wan serdestîya misyoneran pejirandin. Yan jî bi rêbaz û fêlbazî misyoneran xwe kir serdest. Bi vê guhertinê ra pêşengên civakî jî hatin fêrkirin ku ew jî bibin serdest. Bi demê ra hem misyoner û dagirker bûn serdest, hem jî pêşengên civakê bûn serdestê gelê xwe. Bi vî awayî serdestî û bindestî ket nava civakê û bi cih bû. Ji hêla têgehî ve kole-koledar, karker-karmend, worker-boss jî tê gotin. Di xwezaya civakê da çênabe bindest-kole-karker-karmend

hebe. Lê mixabin civaka Efrîka jî ev têgeh nas kir. Bi vê ra bû mehkumê van têgehan. Jîyana wan jî her wisa teşe girt.

Tevî koçberî, penaberî, tevkujîyê, civaka Efrîka aşnayî serdestî û bindestîyê jî bû. Ji ber ku dîyarde û têgihên ku em qala wan dikin, mîna zincîrekê hev û du bandor dikin. Civakek her çiqas penaber nebûbe jî heke rastî van dîyardeyan hatibe, ev rewş bixwe jî mîna penaberbûnê ye. Kesên ku di penabertîyê da civakîbûna xwe ji dest dide, heman mîna wan kesên ku di cih û warê xwe da be, heke van dîyardeyan zor lê kiribe mîna penaberekî lê tê. Lewra jîyana penapertî tenê di penabertîyê da nayê jîyîn. Heke komek yan miletek li ser axa xwe be û ne yê xwe be, heman wekî penaberekî li wan tê.

*5.* ***Hişmendî***: hişmendîya mirovekî çi be, ew mirov jî her ew e. Lewra bûna xwedî hişmendîyeka civakî girîng e. Qasî 200 sal e, pirsgirêka civakan û bi taybet yê şoreşgeran ev e. Hişmendî dewletdar e. Hişê civakî û şoreşgerî jî tê jiberkirin. Lewra wekî pêwîst guhertin û veguhertin çênabin. Tenê Rêber Apoyî ev xeletî û şaş têgihiştin şûna xwe hişt û karibû civakê hem biguherîne hem jî veguherîne.

Di sedsala 15em da, di Parzemîna Efrîka da, hişmendî bi temamî civakî bû. Erê, paşketî bû, bi serdemê ra ne li hev bû lê civakî bû. Parzemîna Efrîka bi avê dorpêçkirî ye. Çardorê wê bi derya û okyanusan ve pêçandî ye. Lewra qeraxên parzemînê bi ber û bereket in. Kaşifên ewropiya

dema ku derketin kifşê, rastî qeraxên parzemînê hatin. Di qeraxan da xwe bi cih kirin. Cih û warên sitratejîk ava kirin. Dest bi dagirkerîyê kirin. Pêrepêre xwe berdan kûrahîya parzemînê. Li kû ji bo wan sûdewer baya, li wan deran xwe bi cih dikirin. Dest bi talanê kirin. Talankarî bi sedên salan didome. Şêwaz û destgirtin diguhere lê talankarî naguhere.
Hişmendîya wan dagirkeran ne civakî û xwezayî bû. Ev sermayedar-resmal-kapîtal in. Têra xwe çavbirçî ne. Ji bo bi destxistina sermaye çi bi destên wan tê dikin. Ser-ma-ye tiştê ku li ser dimîne. Yanî tiştên ku zêdeyî pêwîstîyan e. Her tiştê ku zêde be, di hemû civakên xwezayî û demokratîk da, tê belavkirin, tê dîyarî kirin. Li ser zêdekirina zengînîyan kêmasî û şermeke mezin e. Di heman demê da tawanekî mezin e. Tê ceza kirin. Lê mixabin di pergala dewletdar da, kî karibe zêdetir zengînî bide ser hev, ew jîr û jêhatî tê hesibandin. Ev guhertinek mezin û pir rûxîner e, di jîyana mirovahî ya dîrokî da.
Sermayedarên ku xwe bera Parzemîna Efrîka da, bi vê hişmendîyê ketin nava tevgerê. Her ku li Parzemîna Ewropa pîşesazî bi pêş ket, pêwîstîya wan bi madeyên xam zêdetir bû. Ev madeyên xam jî li Parzemîna Efrîka zêde hebûn. Ji bo komkirin û veguhestina madeyan, jî efrîkî hatin bikaranîn.
Ewropîyan piştî ku xwe li Parzemîna Efrîka bi cih kirin, pêre bajar jî ava kirin. Bi dîn û

perwerde hişmendîya xwe jî veguhestin nava efrîkîyan. Êdî ew efrîkîyên ku bi awayekî komin dijîyan, fêrî xwe zengînkirinê bûn. Çînek serdest û zengîn bi vî awayî hat bi pêş xistin.
Di encam da ewropîyan Ronesans nebirin Parzemîna Efrîka. Wan nexweşîyên xwe hemû veguhestin parzemînê. Di parzemînê da piranîya civakan bi vî awayî hatin nexweşxistin. Wekî şewbê, wekî nexweşîyeka vegir, ewropîyan piranîya mirovên Parzemîna Efrîka nexweş xistin. Êdî hişmendîya wan ne civakî sermayedarî ye. Dem bi dem hewildanên vegera civaka xwezayî û demokratîk hebe jî serkeftî nabin. Ji ber ku hişmendîya sermeyedar pir bi hêz e. Cihekî da dengekî cuda derkeve, di cih da dest lê tê werdan. Lewra dijrabûneka bi tund û serkeftî pêwîst e.

### 5. *Ber Bi Parzemînên Din Ve*

Dagirkerên ku li Parzemîna Efrîka bi cih bûn, bi bindestkirina efrîkîyan têr nedîtin. Piştî ku xwe bicih kirin, vê carê jî efrîkî birin welatê xwe. Dagirkeran efrîkî bi zincîr dikirin û bi keştîyan dibirin welatên xwe. Li welatên xwe ew wekî berdest bikar dianîn. Di vê mijarê da Parzemîna Amerîka xwedî kiryarên pir kirêt e. Bi taybet DYAyê bi sedan salan zilmek mezin kir. Reşikên wan deran bûn mijarê gelek filîm û pirtûkan. Reşik anku efrîkî wekî mirov nedihatin dîtin. Lewra wekî ku ajalekî zindî bin li wan hat meyzandin. Efrîkîyan jî tim li ber xwe didan. Ew di sedsala 20em da bûn xwedî hin mafan.

Lê belê pirsgirêk çareser nebûye û dem bi dem xwe dide der.

Dewletên ewropî yên ku sermayedarî bi pêş xistin û netew dewlet damezirandin jî xwedî heman kiryaran in. Dewletên dagirker û mêtinkar tim tinazên xwe bi efrîkîyan dikin. Civakên xwe jî fêrî vê yekê dikin. Bi vî awayî milletperestî tê kirin. Ji ber rengê çerm, kultur û ziman çênabe miletek biçûk were dîtin. Lê ev hizir di wan welatan da berbelav e.

Destpêkê efrîkî bi darê zorê, bi zincîran dibirin Parzemîna Amerîka û Ewropayê. Lê mixabin di sedsala 20em û pê ve, êdî efrîkî bixwe berê xwe didin Parzemîna Amerîka û Ewropayê. Li her qonaxekî di pergala sermayedar da, mêtinkarî û penaberkirin jî reng diguhere. Di dema sermayedarîya ku xwe dispêre bazirganîyê, dagirkerî û bi darê zorê bindestkirin heye. Di dema fînansê da jî êdî efrîkî bixwe berê xwe dan welatên sermayedarî lê serwer e. Di demekê da ku Parzemîna Efrîka bi darê zorê hat dagirkirin. Bi darê zorê mirov dixebitandin. Paşê pergalê xwe guhert. Ji ber ku êdî bi awayekî çors nedikarî mêtinkarîyê bike. Vê carê jî mejîyê civakan hatin dagirkirin. Bi vî awayî efrîkîyên ku li ser axa xwe bindestî û bi darê zorê xebitandin nepejirandin; îcar wisa li wan kirin ku bixwe berê xwe didin DYA û welatên Ewropa. Ev guhertineka sosret e ku hatîye meydanê.

Gelo rewşa dawî çawa ye? Beşek ji efrîkîyan -wekî ku ji ber teqîna volkanekî birevin- direvin û berê xwe didin

welatên Ewropayê. Di rêyan da birçî dimînin. Heke jin yan zarok be rastî destdirêjîyan tên. Dema ku hewil didin ku deryayê qut bikin û bigihêjin parzemînê, noqî avê dibin û dimirin. Heke hinekan xwe gihand qeraxên parzemînê, îcar li wan deran rastî sivikkirinê tên. Xwe têlan diqelîbînin. Bi kurtî mirina xwe didin ber çavan û wisa ber bi metropolên xwedî xweşikîya xapînok in diçin. Ev jî ji civakîbûn û ji mirovbûnê ketin e. Bi giştî jî pergala sermayedar wisa li civakan kir ku civak ji rê derkevin. Bêguman e ku her bîr û bawerî dema serdestî civakan bibe, destpêkê civakan dişibîne xwe. Sermayedarî wekî bîrdozî lîberalîzm daye ber xwe. Bi vê bîrdozîyê civakan ji rê derdixe û dişibîne xwe.

Ew efrîkîyên ku xwe sînoran diqelibînin, mirina xwe didin ber çavan, nokî deryayan dibin û dimirin; heke vê enerjî û hewildanên xwe rast bikar bînin, li ser axa welatê xwe bimînin û têbikoşin dê karibin baştir û xweştir bijîn. Pergala Sermayedar jî ewqas bi hêz nabe. Temenê vê pergalê jî dirêj nabe.

Kesên ku dibin penaber. Li welatan bi cih dibin. Hêvîya wan tuneye ku di desthilatîyê da cih bigirin. Ji ber vê berê xwe didin werzişê. Dixwazin di werzîşê da serkeftî bin. Dema olîmpîyatan em dibînin ku werzişkarê DYA û yên welatên Ewropayê hene. Di nav wan da hejmarek baş reşik hene. Piranî jî bi navê welatê ku lê ye madalyayan distînin. Bi vî awayî ev welatên wisa ji reşikan sûdeka baş digirin. Hinek ji wan jî dikin populer. Yanî bi nav û deng dibin. Ev jî dibe sedem ku zêdetir kesinên ciwan berê xwe bidin wan welatan. Ev jî

sîyasetek e ku tê kirin. Ji ber ku di wan welatên wisa da pêwîstî bi ciwanan heye ku wan di kar da bixebitînin.

Beşekî din yên penaberan jî bijîşk in. Bijîşkî di encama xwendineka baş da tê bi dest xistin. Penaber jî dema ku dibîne qezenc û îtîbara bijîşkîyê baş e, berê xwe dide vê pîşeyê. Kesên ku hêvîya wan tuneye ku nexweşîyên civakî çareser bikin, berê xwe didin nexweşîyên laş û hewil didin bi vî warî da sûdmend bin. Ev jî kêrî dewletan tê. Dewlet di heman demê da bijîşkên ku nû tên welatên wan, bi qîmetekê nêzikî wan dibin û wan dixin kar.

Ev bijîşkên bi vî rengî, li hember pirsgirêkên civakî xemsar in. Li hember gelê xwe bê xem in. Xwe wekî ku xwe rizgar kiribe dibînin. Girîngî nadin dîrok, kultur, pirsgirêkên netewî ku netewa wan dijî. Hevsengîyek bi dewletê ra datînin û wekî kes û malbat jîyana xwe didomînin.

Hin dewlet hin efrîkîyan dikin serokê dewleta xwe. Hin dewlet jî di asta wezîrtîyê da cih didin efrîkîyan. Di burokrasîyê da cih didin wana. Gelo jiber çi? Mînaka vê yekê Barak Hussein Obama ye.

*Barak Hussein Obama wek serokê 44em yê Dewletên Yekbûyî bi destbikarbûna wî ya yekem di 20ê çileya 2009an da dest pê kir û di 20ê çileya 2017an da bidawî bû. Hilbijartina serokatiyê di sala 2008an da bû. Çar sal şûnda, di hilbijartina serokatiyê ya 2012an da, wî namzedê Komarparêz Mitt Romney têk bir. Ji nû ve hat hilbijartin. Obama yekem serokê Afrîkî-*

*Amerîkî ye, yekem serokê pirreng, yekem serokê nespî û yekem serok e ku li Hawaii ji dayik bûye. Obama bi du dewran hat sînordarkirin û Donald Trumpê Komarî yê ku di hilbijartinên serokatiyê yên sala 2016an da bi ser ketibû şûna wî girt.*

DYA ji bo ku bêje reşik dibin serokê dewletê jî ew kirin serok. Bi vê yekê xwestin leke û qirêjîya ku dîrokî ye û li ser wan e, xwe jê bişon. Ji civaka DYA û ji gelên dinyayê ra bêjin ku va ye tu zext û tehda li ser reşikan nîne. Îmaja Obama ji bo xapandina dinyayê dest dida. Lewra di qada sîyasî da jî ew hat bikaranîn.

Gelek dewletên ku Parzemîna Efrîka dagir kirin û bi sedsalan ew mijandin, niha dem bi dem raşikan di sîyasetê da didin pêş. Ev jî dîsa xapandin û bikaranîn e. Her ku kiryarên van dewletan deşîfre dibin û tên zanîn, rêbaz diguherin. Ji nû ve xapandinan dikin. Lewra jî heta ku ev pergal û ev dewletana hebin, dê xapandin, bikaranîn û mêtinkarî hebin. Tekane çare jî ev e ku mirovatî şîyar bibe û vê pergalê bê bandor bike.

## Li Kurdistanê 1.800î û Şûnda

Bi taybet di dîroka me kurdan da û bi giştî di dîroka mirovahîyê da sedsala 19em û bîstem xwedî girîngîyeka taybet e. Hezar û 800î û şûnda dîroka ji ya berîya xwe pir cuda hatîye jîyîn. Lê di van her du sedsalan da herî zêde kurdan têda wenda kir. Sedemên wê yên cur bi cur hene. Ji wana yek jî rewşa kurdan ya xwe bi xwe ye.

Di dirêjahîya dîrokê da kurdan hîmê şoreşa gundan danî. Peyderpey şaristanî danîn û bi pêş xistin. Lewra -bi hêsanî ez dikarim bibêjim ku- tevkarîya ku kurdan ji bo mirovahîyê kirîye tu miletekî din nekirîye. Kurdan di xwe da çand û ziman bi pêş xistin û ew kirin malê mirovahîyê hemû. Lê mixabin 1800î û şûnda kurd gelekî bi paş man. Di van her du sedsalan da kurdan li ber xwe dan. Komkujî bi ser wan da hatin. Gelek caran ji cih û warên xwe bûn. Bi mijarê ve girêdayî divê em sedemên vê dîroka bi êş ya kurdan nîşan bidin. Ji ber ku bi giştî di xwezayê da bandorên derve nabin dîyarîker. Ya ku di dîyardeyekî da dîyarîker e, dînamîkên hundirîn in. Lewra divê wekî gel em berê xwe bidin xwe ku em karibin ji vê dîroka merez rizgar bibin.

Divê em xwe ji lewaztîyên hundirîn rizgar bikin. Di xwe da hêz ava bikin. Başîyên xwe deynin milekê û nebaşîyên xwe deynin milê din. Yanî em xwe bi xwe, xwe bi moxila kurdî bixin. Xwe ji kirêtîyên xwe bişon. Bi vî awayî em dê dijminan baş binasin. Lome nekin lê li hember wan şîyar bin. Em dê nehêlin dijmin hêkê xwe deyne hêlîna me. Paşê di nav me da mezin bibe û wekî ku ji me be, di nava me da karê xwe bike. Ji ber ku em

xwedî ezmuneka dîrokî ne. Em dê êdî ji bo xwe kar bikin. Derkevin pêş û dîsa ji mirovahîyê ra pêşengtîyê bikin. Êdî bes e! Me wekî gel têra xwe jîyaneka kirêt jîya. Dem êdî dema xweşî û başîyan e.

Di du sed salên dawî da bi dehan serhildanên me hene. Hin ji wan dorfireh û bi bandor in. Hin ji wan jî herêmî ne û demkurt in. Lê belê her çawa be jî di encamê da penabertî heye. Penabertîya di nava welat û yê dervayî welat heye. Piranî di encama serhildanan da kurd dibin penaber. Lewra jî ez dê hin serhildanan bigirim dest û binirxînim.

## Serhildana Babanzadeyan

Serhildana Babanzadeyan bi pêşengtîya êla baban dest pê dike. Êl li herêma Silêmanîyê berbelav e. Di demekî da ku feodalîzm hatîye derbaskirin, bi hizra feodalîzmê radibe. Ji sala 1806an heta sala 1851ê, di herêmê da kurd di tevgerê da ne. Li hember Împaratorîya Osmanîyan carna serkeftin carna jî binkeftin heye. Sedemê serkeftinê egîdîya kurdan e. Sedemê binkeftinê jî xayintîya hin serekêl û bendeyên wan e. Xetek yê berxwedanê heye lê mixabin xetek yê xiyanetê jî reng dide rêveçûna dîrokê.

Di vê serhildanê da cih guhertin anku penabertî heye. Penabertî li nav welat e. Ji Silêmanî ber bi rojhilatê Silêmanî ve çûyin heye. Piranî qîl û qal û nivîs li ser serekê êl e. Kiryarên ku di wê demê da sepandine ser gel, zêde nayê zanîn. Tişta ku em pê derdixin jî ev e ku: Her penaberîyek ne tenê jîyana serekêl û serhildêran têk dide, di heman demê da gel û girseyên ku gund û bajaran dimînin zêdetir perîşanîyê dijîn.

## Serhildana Bedirxanîyan

Serê pêşî ez vî bêjim: Rexne li serhildanan girtin, rêzgirtin ji serhildanan ra ye. Heke em serek û malbata serhildêran rexne dikin, em dixwazin şayenî wan bin. Tenê pesindan û pozîtîvekirina serhildan û serhildêran, tiştek bi destê me nakeve. Ji xencî Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd, piranî serhildan û serhildêr bi pesnî tên destgirtin. Ev jî me nezan û çavkor dike. Dihêle ku kêm û kûrîyên me bi berdewamî hebin. Di heman demê da dahûrîna dîrokê û serhildan û serhildêran dê rêyeka rast li ber me rast bike ku em li ser wê rêkê têbikoşin û serkeftî bin.

Rastîyeka din jî heye ku divê ez qal bikim. Ev jî ev e ku dema serhildan bibin dikevin, yên paşmayî berê xwe didin nivîskarîyê. Hinek jî berê xwe didin hunerê. Hin ji wan jî berê xwe didin pîşeyên wekî bijîşkî, mafnasî û hwd. Ji ber ku di qada sîyasî da bibin ketine, êdî nikarin berê xwe bidin sîyasetê. Derfetên ku bibin desthilat û rêvebir namînin lewra xwe ji qadên din diceribînin ku serkeftî bibin. Di sedsalên 19em û 20em da piranîya çîna serdest ya kurdan tuşî vê rastîyê bûne. Pîr, şêx û rewşenbîran yan bi awayekî jîyana xwe ji dest dane, yan jî berê xwe dane qadên cuda yên jîyanê.

Ji hêla penaberîyê ve herî zêde malbata bedirxanîyan êş û azar kişandîye. Malbat li welatên Ewropa û li welatên Rojhilata Navîn belav bûye. Piştî têkçûna serhildanê, berê xwe dane xwendinê. Piştî ku desthilatîya kurdan neket dest malbatê, wan berê xwe dane xwendinê ku li

xerîbîyê be jî bibin xwedîyê sitatû. Ev jî ji taybetmendîyên wan yê feodal tê ku xwe wekî xwedîyê kurdan dibînin. Bê guman kar û barên zanistîyê jî hêja ne. Lêbelê ji wan dihat xwestin ku kurdan bikin xwedî pergaleka sîyasî. Heke kurd heta sedsala 21em jî ne xwedîyê pergal û sitatûyekê bin, para wan malbat û xanedanan dîyarîker e. Divê ev ji vê hêlê ve jî bên rexnekirin.

## Serhildana Rewandiz

Mîr Mihemed ku ji eyûbîyan e, li Rewandizê dest bi serhildanê dike. Derfet heye ku serhildan bi ser bikeve. Lê mixabin dawîyê wî dîl digirin û dibin Îstanbûlê. Paşê vedigerînin ku were li ser axa bav û kalên xwe. Di rê da bi reşkujîyekê jîyana xwe ji dest dide.

Çarenûsa serokan çarenûsa gel jî dîyar dike. Piştî serhildanê radestbûn, paşê jî neçarî penaberîyê tê kirin. Di ser da jî wekî ku lihevhatin hebe, li Îstanbûlê berê xwe dide herema ku lê serî rakir. Dawîya dawî di rêda rastî êrîşê tê. Bê guman e ku osmanî û qacarî ji bo serokê kurdan çi biryar dabin dê heman biryarî ji bo gel jî bidin.

Wekî her serhildanî vê carê jî gelê kurd hem tê kuştin hem jî neçarî penaberîyê tê kirin. Pê ve girêdayî erdnîgarîya kurdan tê talankirin û tê şewitandin. Gelek êl û gundî û bajarî neçarî cih guhertinê dibin. Ev jî bi xwe ra paştamayîna civakî tîne. Bi vî awayî kurd her hewil didin ku di jîyanê da bimînin. Lewra zanist, felsefe, huner, ziman û hwd di nav kurdan da pêş nakeve.

Piştî Mîr Mihemed, Şêx Ubeydullahê Nehrî dest bi serhildanê dike. Dem bi dem serkeftin dem bi dem jî şikestin heye. Li ser axa Kurdistanê osmanî û qacar hene. Tevî van her du hêzên dagirker, birîtanî, rûs û amerîkî jî hene. Wekî misyoner kar dikin. Birîtanî û amerîkî milê osmanîyan digirin. Rus jî milê qacaran digirin. Kurd dimînin di navbera van hêzan da. Li ser axa xwe ne, lê ne xwedî axa xwe ne. Her hêz li gorî berjewendîyên xwe hesaban li ser kurdan û axa bi ber ya kurdan dikin. Tu

kes nabêje ku ev gel li ser axa xwe ye. Gelo ma mafên wan tune ye? Wekî her gelî li ser axa xwe bijîn û xwe bi rê ve bibin.

Kurd heke li ser welatê xwe serwer bin, dê bibin hêzekî mezin û bi bandor. Lewra hêzên derekî her hewil didin Kurdistanê dagir bikin. Heke nebû, ne ku Kurdistanê bi kurdan ra parve bikin, her hewil didin di navbera xwe da parve bikin. Ji bo van hebûn û tune bûna gelê kurd ne girîng e.

Şêx Ubeydullahê Nehrî jî her hewil daye ku mîrtîyeka kurdan damezirîne. Lê ew jî destpêkê radestî osmanîyan dibe. Wî jî dibin Îstanbûlê. Paşê ji wir jî bi rê dikin heta Erebistana Siûdî ya îro ku dibin dagirkerîya osmanîyan da ye. Herî dawî li xerîbîyê sala 1883 jîyana xwe ji dest dide.

Gelê kurd dîsa bê serok û serdar dimîne. Wekî bedenê ku serê wî hatibe jêkirin, li rastê dimîne. Êdî dagirker bi dilê xwe çi bixwazin bi serê gelê kurd da tînin. Lê dîroka gelê kurd bi kok e. Çand û zimanê wan zengîn e. Lewra her dimînin û dê her bimînin.

## Dema Şoreşa Hemdem
## Rêwîtîya Ber Bi Ewropa Ve

Rêber Apoyî bi çûyina Ankara û li wir xwendina wî hişt ku bîrdozîya civakparêzîyê binase. Li Ankara berê xwe da paytexta Kurdistanê Amed. Li Amedê jî civaka kurd ji nêzîk ve nas kir. Ji Amedê berê xwe da Îstanbûlê. Dest bi xwendina bilind kir. Lê beş beşê mafnasî bû. Lewra bi derfetên ku bi dest xistî berê xwe da zanîngeha Ankara, beşê zanistên sîyasî. Yanî xwe berda nîveka paytexta kujer û sîyaseta wê.

Rêbertî piştî ku têgihişt ku ne bi rêxistinên kurdan ra ne jî bi rêxistinên tirkan ra tiştek bi dest nakeve, kete nav hewildanan û koma xwe damezirand. Ji sala 1973an heta sala 1976an li Ankara têkoşîn hat kirin. Lê êdî dem hatibû, zêdetir mayina li Ankara dê koma şoreşger ya ku Rêber Apoyî damezirand, negihaba armanca xwe. Lewra Rêbertî û komê berê xwe dan Kurdistanê. Gav bi gav bîr û bawerî di nava civakê da belav dibû. Li gorî vê têkoşînê kadro jî zêde dibûn. Yanî koma Şoreşgerên Kurdistanê, koma Apoyî serî girtibû û diçû.

Dewleta tirkan û serî da DYA hêzên NATO jî ev rewş dîtin. Vana bi hev ra hewil dan ku pêşîya koma Apoyî bigire. Amadekarî dihatin kirin ku li Tirkîyeyê derbeyeka din çêbe. Bê guman li hember Apoyîyan. Rêber Apoyî ev rewş ji nêzik ve dişopand. Di encamê da têgihişt ku dê derbe çêbe. Dijmin dixwest hîna destpêka têkoşînê da serek û kadroyên tevgerê yên pêşeng ji holê rake. Bi rastî jî heke tedbîr nehatibana girtin, dibe ku

kom ji holê bihata rakirin. Ji ber vê yekê Rêbertî berê xwe da dervayî bakurê Kurdistanê.

Rêbertî havîna sala 1973an berê xwe da Kobanê. Piştî demekê li wir çû paytexta Sûrîyeyê. Pêdepêde xwe gihand Beyrûta paytexta Libnanê. Xwe gihand partî û rêxistinên Filistînî. Qonaxekî dîrokî bi vî awayî dest pê kir. Ew qonax bi hêsanî derbas nebû. Hemû derfetên ku PKKê li van qadan bi dest xistibin tev keda Rêber Apo ye. Wek alîkar her çiqas kadroyên pêşeng hebin jî ya dîyarîker têkoşîna Rêber Apo bixwe ye. Heke ne ew bûya kesekî din nikarîbû qada Libnan û Sûrîyeyê di vê astê da bikar bîne.

Ji sala 1979an heta sala 1998an Rêber Apoyî Şam û Beyrût pir baş bikar anî. Ev qadana bûn qadên wisa ku hertim wek kanîyekê hênik yên zozan û gelîyên Kurdistanê tim PKK xweyî kir. Tim hêz da têkoşîna gerîla û gel. Bi awayekî ku di dîrokê da mînakê wê tune ne Rêber Apo hem li wan qadan ma hem jî pê şoreşa Kurdistanê yê hemdem tim ber bi pêş ve bir.

Ji ber gelek sedemên cur bi cur û mezinbûn û firehbûna şoreşa Kurdistanê, di serî da dewleta tirk, hema bêje hemû dewletên NATO ketin nava tevgerê. Armanca wan ev bû ku Rêbertî ji holê rakin û tevgera PKKê tune bikin. Rewşek wekî berîya derbeya 12ê îlona 1980ê hatibû pêş. Lewra Rêbertî dîsa ket nava hewildanan ku tevgera azadîyê û gelê kurd biparêze. Diviyabû gaveka dîrokî bihata avêtin. Lêbelê çawa?

Taybetmendîyên Rêber Apo gelek in. Ji wan yek jî astengî nenaskirin e. Rewş herçiqas aloz be, astengî hebin jî Rêbertî rêyekê vedike û dimeşe. Piştî ku derfeta mayina li Sûrîyeyê nema, Rêbertî xwest ber bi Ewropa ve gavekê biavêje. Jê armanc jî ev bû ku pirsgirêkên zemînê ku jê derket çareser bike. Sedemê bindestîya kurdan û komkujîyên ku bi ser kurdan da hatine kirin, yek jê Ankara ye yê din jî Ewropa ye. Ji ber ku ev 2 sed sal e, di serî da Birîtanya, dewletên ewropî biryar dan ku Kurdistan bibe 4 parçe. Di dema şoreşa PKKê da jî di serî da Birîtanya, DYA û bi giştî NATO her piştgirî dan dewleta tirkan. Heta niha jî ev hêz û dewet in ku nahêlin kurd bigihêjin mafên xwe yên netewî.

Rêbertî dixwest bi van hêzan ra pirsgirêkê çareser bike. Ji ber ku bi şoreşa PKKê, rewşa kurdan bû navnetewî. Êdî diviyabû hevdîtin û rêyên çareserîyê jî di vê astê da bana. Rêbertî çawa ku gav avêt Yewnanistanê tê gihişt ku li holê komployek heye. Paşê Rêbertî got: Em ji Ankara derketin me partî ava kir; bi ketina Ewropa ra em dê dewletê ava bikin. Ji vê pênaseyê jî em têdigihijin ku armanca Rêbertî damezirandina dewleta kurdî bû ku wê demê hîna paradîgmaya nû neafirandibû. Yanî hîna dev ji dewletbûnê berneda bû. Di bingeh da Rêbertî dixwest ji kurdan ra cihekî jîyanê veke ku kurd karibin ji bindestîyê derkevin û bi awayekî azad bijîn.

Kurdan ji salên 60î û şûnda berê xwe dan dewletên Ewropa. Kurd bi piranî jî diçûn Almanyayê û bi cih dibûn. Salên 1970ê û şûnda wekî penaberê sîyasî kurdan berê xwe dan dewletên Ewropa. Piştî derbeya 12ê îlona

1980ê, gelek kurdên têkoşer çûn xwe sipartin Ewropa lê bimînin û bijîn. Êdî her kurdê ku diçû Ewropa xwe dispart têkoşîna PKKê û digot ez sîyasî me. Ji wan ra piranî îzina mayina wan welatan dihat dayîn. Paşê wisa lê hat ku ji civakên Tirkîyeyê kesek ji kîjan miletî ba digot ez kurdim û li Ewropa dima. Yan jî girêdanîya xwe bi awayekî bi doza kurdan ra datanî û doza mayina wek kesekî sîyasî dikir. Ev rewş heta niha jî (sal 2024 e) heye.

Rêber apo ku rêbertîya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd dike, nikarîbû li Ewropa bimîne. Her kesê ku xwe sipart Ewropa ji Rêber Apo sûd girt lê ev maf ji bo Rêber Apo derbasdar nebû. Herçiqas hin dewletan xwestibin cihek ji Rêber Apo ra veqetînin jî Birîtanya, DYA û Îsraîlê zextên mezin li wan dewletan kir. Nehişt ku cihek ji Rêber Apo ra were veqetandin. Di serî da şertê DYA ev bû ku heke Rêber Apo li Ewropa bimîne jî diviyabû di xizmeta wan dewletan da bûya. Ev jî daxwazîyek wisa ye ku qet li gel Rêber Apo nagunce.

Erê, hinek serekên partîyên kurdan û tirkan jî çûn Ewropayê. Bi salan lê man. Hinek ji wan li ewropa jîyana xwe ji dest dan. Hinak ji wan jî piştî salên dûr û dirêj vegerîyan bakurê Kurdistan û Tirkîyeyê. Gelo çima?

Di vê xalê da jî divê dîrokîbûn, girîngî û mezinbûna Rêber Apo were dîtin. Were dîtin ku Rêbertîya Rêber Apo ji bo kurdan çiqas girîng û dîrokî ye. Ji bo gelên Rojhilata navîn serî da, ji bo hemû mirovatîyê çi ye yan ne çi ye.  Bê îstîsna hemû partî û serekên wan yên kurd û tirk, tiştek bi ser nexistin. Lê belê Rêbertî tevî hemû gef

û astengîyan, tevî ku dîl ket destê dijmin jî şoreş bi berdewamî ser xist û bi rê ve bir.

Ji ber ku pêvajoya komplo bi nivîskî, dîmen û deng heye, ez dê nekevim di nava hurgilîyan. Dawîya dawî Ewropayê hiquqa xwe jî binpê kir û Rêbertî revand dervayî Ewropa. Paşê jî radestî dewleta tirkan hat kirin. Lê belê di encam da her çi çawa bûbe jî li Ewropa mayina Rêber Apo nehat pejirandin. Vî jî herçiqas metirsîyên mezin bi xwe ra anî be jî Rêbertî bersiveka baş da û şoreş gihand asteka nû.

## Penabertîya Partîyên Sîyasî

Di destpêka hin dînan da û di rastîya hin partîyên sîyasî da, penabertî heye. Hin ji wan bi awayekî serkeftî vedigerin li ser axa xwe û têkoşîn dikin. Di encamê da jî bi ser dikevin. Lê hin partîyên sîyasî dimînin li penabertîyê. Bê bandor dibin. Ji armanca xwe ya destpêkê dur dikevin. Hene lê ne wekî partîyeka sîyasî û şoreşger. Dimînin mîna rêxistineke şaristan (medenî-sivîl). Bi taybet 60 salên dawî hin partîyên Kurdistanê û yên Tirkîyeyê wisa ne. Hin partî li penabertîyê helîyan û çûn. Di dawîyê da serekê wan partîyan bi tena serê xwe vegerîyan welat.

Li Rojhilatî Kurdistanê, piştî rûxandina Komara Mehabadê, têkoşîna kurdan her bi berdewamî heye. Qazî Mihemed hat bi darvekirin. Dr. Qasimlo û Şerefkendî hatin şehîdkirin. Xiyanet hebû. Partî bi pev ketin. Salên 1990î da partîyan berê xwe da başûrê Kurdistanê. Dem bi dem hin hewildan hebin jî êdî van partîyan nikarî têbikoşin. Man li penaberîyê. Di wargehên taybet da hatin bi cih kirin. Dem bi dem êrîş li ser wan tên kirin. Herî dawî jî ev partî hatin bêçek kirin. Hin serekên wan jî berê xwe dan welatên Ewropayê.

Ev partîyên ku mijara gotinê ne, li ser lingan tên hiştin. Ji ber ku wan hem bikar tînin hem jî hebûna wan nahêle ku partîyên nû werin ava kirin. Divê têkoşerên Rojhilatî Kurdistanê vê rewşê derbas bikin. Li gorî têkoşîna sedsala 21em, xwe bi rêxistin bikin û têbikoşin. Bi partî û rêbazê sedsala 20em, di sedsala 21em da serkeftin bi dest nakeve.

Salên 2000an û şûnda, PJAKê li Rojhilatî Kurdistanê dest bi têkoşînê kir. Heta niha jî bi awayekî rast û serkeftî têdikoşe. Li warên azad dimîne, ne li kampên penaberan. Xwedî hêza leşkerî û ya civakî ye. Heke bermahîyên partîyên kurdî bi PJAKê ra bibin yek, dikarin rista xwe bigerînin. Ji bo gelê xwe sûdewer bin. Hêvî jî ev e.

## Koçbertîya Jîngehî (Ekolojî)

Ji dîrokê bigire heta roja me ya îroj, filaketên xwezayî hene. Ji hin hêlan ve mirov dikarin pêşî lê bigirin. Mînak: Teknolojîya îroj dest dide ku berîya erdhejê pêşbînî werin kirin. Sitargeh û xanî wisa tên lêkirin ku di erdhejê da rûxandin çênebe. Derfet heye ku pêşîya lehîyên ku zirarê bidin gund û bajaran bê girtin. Dîsa jî -di rastîyê da ji ber xemsarî û bêxemîya hin dewletan- gund û bajar ji filaketên xwezayî zirarên mezin dibînin.

Heke em pergala sermayedar bigirin dest, em dibînin ku hişmendîya ku heye bixwe felaketên xwezayî diafirîne. Ev jî dibe sedem ku di asta dinyayê da koçberî çêbibe. Her sal û demsal di devereka dinyayê da ji ber filaketan bi milyonan mirov ji cihê xwe radibin. Êdî wisa lê hatîye, hevsengîya xwezayê hatîyê têkbirin. Lewra nayê zanîn bê ka kû devera dinyayê da dê çi bibe. Li deverên ku qet baran wisa nabare, ji nişka ve barîna baranan, nîşan dide ku rewşa filaketên xirabkar dê zêdetir bibe.

## Erdhej

Tovika dinyaya me agir e. Di nava xwe da dikele. Di navbera agir û rûyê erdî da, bi demê ra valatî çêdibin. Dîsa bi demê ra valahîya ku zikê dinyayê da çêbûye, şikestin çêdibe. Li gorî valahîyan enerjîyek jî tê ser hev û asê dibe. Dema ku valahî tê hevûdu yan jî tevger di nava wan da çêbe erd diheje.

Destwerdanek li ser binê erdê nayê kirin. Lê li ser rûyê erdê mirov dikarin pêşgirîyên pêwîst bigirin. Di vî warî da, Japonya ji ber ku xwedî dîyardeya erdhejan e,

pêşgirîyên pêwîst girtine. Lê li gelek deverên dinyayê da wekî pêwîst pêşgirî nayin girtin. Ev jî dibe sedem ku di encama erdhejan da filaketên mezin rû bidin. Di encamê da, hem kuştî çêdibin hem jî birîndarbûn. Ji ber wêranîyan jî gelhe berê xwe dide warên cuda. Yanî dibin koçber.

Ji bo erdhejan gelek bûyer û dane hene. Li Kurdistanê, Tirkîye û di tevahîya dinyayê da bobelatên herî zêde çêdibin erdhej in. Sedsala 20em da, li bakurê Kurdistanê gelek erdhej çêbûne. Lê ji bo me erdheja ku di sala 2023an da çêbû, hînker û fêrker e. Di 06ê sibata 2023an da, li Tirkîyeyê bi mezinahîya 7.8 û 7.5 du erdhejên rûxîner çêbûn. Heke em li encamê binêrin: Ji Gurgumê heta Hatayê bajar, bajarok, gund û gundik li ser hev neman. Tirkîye wekî dewlet tevî ku baca erdhejan ji welatîyan distîne jî tu amadekarî ji bo erdhejê nekirîye. Xanî û avahî ne li gorî rewşa erdhejê ne. Tevî vê mutehît di dema lêkirinê da xanî û avahîyan wekî pêwîst lê nakin ku qezencê wan zêdetir bibe. Dewlet jî çavdêrîyeka baş li ser mutehîdan nake.

Di rewşa erdhejê da, dewlet dê çi bike? Divê xwedî amadekarîyên çawa be? Ev nayê zanîn. Dema ku erdhej çêbû jî dewlet bi sazîyên xwe yên têkildar ve nikare tiştek bike. Lewra welatî bêçare man. Tevî vê rayedar û rêvebirên sazîyên dewletê, gelek alav û amûrên ku ji bo erdhejan hatibûn veqetandin dizîn. Vê jî rewşa ku heye girantir kir.

Di encama erdhejê da bi deh hezaran mirovan jîyana xwe ji dest dan. Di dawîyê da, hejmarek misoger û pê bawer derneket holê ku bê ka em bizanin çiqas mirovan jîyana xwe ji dest dane. Hejmara birîndaran bi zelalî nehat dîyarkirin. Bi vî awayî rewşeka pir bi dilêş derket holê. Ji ber rizandina civakî, hin sazî, rêvebir û xasokan rewşa heyî vegerandin şelandin, rant û dizîyê.

Di erdhejê da, pitik û zarok bê xwedî man. Wenda bûn. Ev pitik û zarok bi rêka dewletê ketin destê hin sazîyên dînî. Çarenusa van zarokan nayê zanîn. Ev jî rûyê dewlet û sazîyên wî ya bi hov e. Wekî pêwîst li ser vê mijarê sekinandin jî çênebû.

Di encamê da ji bajar û gundan gelek kesan koçî bajarên din kirin. Hin kes jî man di cihê xwe da. Tevî ku 3 sal li ser erdhejê ra derbas bûye, hîna jî pirsgirêkên gel nehatine çareserkirin. Pirsgirêkên ku koçber dijîn ne di rojevê da ye. Ji ber ku dewlet xemsar civak jî nezan û ne rêxistinkirî ye.

## Volkan

Gelo volkan çi ye? Çawa çêdibe? Encamên xwe yên rûxîner û yê sûdewer çi ne? Teqîna volkanan teqîna kevirên helîyayî ye. Perçeyên kevirên germ û gazên germ bi rêya volkanekî ku qulikek di qalikê dinyayê da vedike. Ev bi rêya gaza magma çêdibe. Teqînên volkanîk dikarin bibin sedema windahîyên karesatbarên jîyana mirovan, wîrankirina xweza û avhewayê. Di heman demê da dibin sedema koçbertîyan. Teqînên volkanan di mîtolojîya mirovan da jî cih girtine. Bûne mijara çîrokan. Teqînên volkanîk di guherîna avhewayê da çawa rol dilîzin? Bi gazên ku derdikevin wekî karbondîoksît, bandora xwe li ser germbûnê dike. Di heman demê da xwelî, toz û gazên wekî sulfur dîoksît dikarin germahîya heyî daxin.

Volkan ji ber germahîya ku di bin rûyê erdê da ye çêdibe. Pirî caran bi kombûna gaza magmayê ku kevirê helîyayî ya binê erdî ye, di nêzikî rûyê erdî da dest pê dike. Dibe ku bi rêya buxar û gazê ku qulikên biçûk di rûyê erdî da vedike çêbe. Dibe ku di encama erdhejê da jî volkan biteqin. Di hin rewşan da jî magma wekî ku lûleyekê ra derbas bibe, wekî lavekê zirav û herikbar derkeve ser rûyê erdî. Volkan dikare bi deh hezaran metre ber bi asîman ve bipijiqe. Volkan her tiştê li ser rêya xwe dişewitîne.

Heke xwelî yan gazên ku derdikevin, li ser zevîyek berfê ya bilind yan jî li ser cemedê kom bibin, ew dikarin qeşa yan jî berfê bihelînin. Di encamê da lehîyên filaketbar çêdibin. Erd dişemite û diçe. Xwelîya volkanan dibe

sedemên nexweşîyên tengenefesê. Her kesê ku ji filaketên volkanî rizgar bibe, ber bi warên din da dest bi koçberîyê dike. Ew jî dibe sedema têkçûna aborîyê û mirov nikarin debara xwe bikin. Di hin teqînan da, bi taybet li Îslandayê, ji ber ku li asîman tabaqa ewran bi xwelî çêdibe, çûn û hatina firokeyan ji bo çend rojan rawestîyaye.

Têgeha volkan ji navê xwedayê agir yê xwedayê romayîyên kevin tê. Teqîna volkana herî bi bandor ya tê zanîn, teqîna Çîyayê Tanbora ye. Li Endonezyayê sala 1815an diteqe. Ev teqîna herî mezin a dîroka tomarkirî ye. Bandoreka mezin li ser avhewaya cîhanê kir. Volkanê gazên cur bi cur berda atmosferê. Ev material di atmosferê da ketin navbera tîrêjên rojê û dinyayê. Di encamê da germahîya dinyayê heta 3 dereceyan kêm kir. Lewra dihat gotin ku sala bê dê bê havîn be.

Teqînên volkanan di asta gerdûnê da heye. Ev teqîn dibin sedemên guhertinan.  Ji zikê dinyayê jî ji ber hêza kişandina erdê jî bûyerên volkanê tên holê. Ev qanûnekî bingehîn ya gerdûnê ye. Ev agahî ji bo serwextbûna mijarê ye. Naxwe em zanyarên jeolojî nînin. Mijar jeolog, bîyolog û sosyologan û pê ve girêdayî hemû cîhana me ve jî têkîldar e.

Mîna erdhejê ji bo volkanan jî divê pêşîlêgirtin hebe. Herêmên ku dibetîya volkanan hebe, divê bi awayekî zanistî werin şopandin. Ji bo her dibetîya volkan û di encamê da koçberîya ku çêbibe, divê pêşîlêgirtin hebin.

Koçber bi lezûbez werin veguhestin û pêdivîyên wan jî werin bersivandin.

## Bahozên Rûxîner

Dinyaya me xwedî ahengeka rewşedar e. Ba jî pêkhateyeka girîng a xwezaya me ye. Em bihizirin ku ba yekcar tune be. Gelo dê jîyan çawa be? Lewra di xwezayê da cihê her tiştekî bi wata heye. Tu tişt bê wata nîne.

Bahozên sivik, tund, tundtir û tundtirîn jî hene. Her wisa bahoz hene. Di vir da ya girîng ev e ku, bi destê mirovan desttêwerdan li ser ahenga xwezayê neyê kirin. Dema ku xweza xwe bixwe ser û bin bibe, xwe bi berdewamî didomîne. Lê dema ku bi destê mirovan desttêwerdan were kirin hingî metirsîya jîyanî ava dibe.

Bahoz axê vediguhezîne devereka din. Heke daristan û çîmen hebe ev yek nabe. Bahoz erdên çandinîyê zuha dikin. Dibin sedema şemitîna axê. Li Parzemîna Amerîka bahozên giran radibin. Xisareka mezin dide gund û bajaran. Jîyana civakî ser û bin dibe.

Di encamê da, mirov neçar dimînin ku cih û warên xwe biterikînin. Heke em xwezayê mîna dêya xwe bibînin. Di hemêza wê da rast bijîn. Hingî em dikarin rûxandina xwezayê bisekinînin. Bi vî awayî jî em dikarin pêşîya koçberîya ku xwe dispêre bûyerên jîngehê kêmtir bikin.

## Lehî

Lehî ji ber barana zêde radibe. Her ku asta germahîyê bilind dibe qeşayên li ser rûyê erdî dihelin. Li derya û zeryayan da asta avê bilind dibe. Tunekirin yan jî kêmkirina daristanan jî dibe sedem ku dema lehî rabû xusara mezin bide mirov û xwezayê bixwe.

Bajar di şûna lehîyan da tên lêkirin. Dibe ku demek di wan şûnan ra lehî ranebûbe, lê belê demek jî tê ku dîsa lehî radibin. Di van rewşan da bajar yan gund dimînin bin lehîyan da. Lehî dema rabû, rêya xwe dibîne û diçe. Heke rêgirî lê hatibe kirin, hingî xezeba lehîyê zêde ye. Dîsa divê bi pîlansazîyên baş, rêyên tahlîyekirina lehîyan hebe. Hekena lehî pir rûxîner in. Çi hat ber wê hildigire û dibe.

Aşût jî her wisa mîna lehîyê ye. Bi taybet di Kurdistanê da, aşût hene. Jîyana kevnar da pêşîlêgirtin heye. Mîmarîya gundên Kurdistanê li gorî aşûtê ye. Tu kes li ser rêya aşûtê xanîyan lê nake. Lê di jîyana modern da, qasî civaka kevnar jî pêşîlêgirtin tune ye. Taybet dema ku rêyên nû tên vekirin, pêşîlêgirtin nayê kirin.

## Erozyon, Darbirîn, Çolkirin

Erozyon, pişiran, maşîneya erdê: Di asta cîhanê da, erozyon heye. Li Kurdistanê jî ev dîyarde tê dîtin. Hin deveran tevî ku gund lê ye jî hêdîka, di nava salan da erd dişemite û diçe. Qelîştok di nava axê da vedibin. Di hin cihan da jî erd ji ber valatîya binî, diçe xwarê. Ev jî li ser jîyana niştecihan metirsîyan çêdike. Girse neçar dimîne ku ji cihê xwe bar bike û biçe.

Di dîyardeya aktuelan ra yek jî darbirîn e. Di asta dinyayê da, ji hêla sermayedaran ve dar her tên birîn. Daristan her ku diçe kêm dibin. Tevî hemû hişyarîyan, li ser rûyê erdî dar kêm dibin. Ji ber ku hêza sermayedaran zêdetir e ji ya zanyaran. Li gor bawerîyên kevnar jî darbirîn serbirîn e. Li hin welatan piratîkên baş hebin jî bi giştî her ku diçe li ser rûyê erdî dar kêm dibin.

Em bên li ser Kurdistanê. Kurd di rastîya xwe da jîngehparêz in. Lê dagirker her hewil didin ku ji vê hêlê ve jî Kurdistanê bimijin. Tê gotin ku demekê di navbera Amed û Rihayê tev daristan bû. Dewleta Osmanîyan bi biviran dikeve nav û di navbera her du bajaran da rê vedike. Di dema Komara Tirkîyeyê da jî ev piratîk bi berdewamî heye.

Kurd, bav û bavkalên me di nava daristanan da bi awayekî çêker dimînin û jê sûd digirin. Daran dibirin û pê komir çêdikin lê bi vê piratîkê daristan tune nabe, berovajî xurttir dibe. Ji bo bizinan çilo bi awayekî bi rêk û pêk tê birîn, lê belê bi vî awayê birînê dar zêdetir xurt

dibe. Ji bo zivistanê êzing tên komkirin. Piranî ji darên hişkbûyî. Ev jî tu zirarekî nade dar û daristanan.

Kurd bi bivir daran dibirin. Dar heke bi bivir were birîn, ji binî ve xurttir derdikeve û xwe zêde dike. Heke darmazî, darberû were şewitandin jî dîsa ji binî ve xwe xurt dike û ji berê gurtir û baştir derdikeve. Gundîyên Kurdistanê bi vî awayî sûdeka baş ji daristanên xwe digirin û hem jî xurttir dikin.

Bi taybet sala 1990î û şûnda, bi destê dewletê û artêşa wê kiryar derketin holê. Hin deveran bi destê cerdevan û cehşan, dar ji kokê ve tê hildan. Rayên ku nava axê da jî nahêlin. Lewra Çîyayên Kurdistanê mîna çolterên Erebistana Siûdî lê tê. Dîsa darên xweşik û kokqalin bi motoran tên jêkirin. Êdî sedem çi be, ev darên ku bi motoran tên jêkirin êdî zîl nadin. Lewra pir ne baş e ku dar bi motoran bên birîn. Bi taybet darberû û darmazî. Artêşa Tirkîyeyê, li kûr xal yan jî baregeh ava bike, darên der û dor dibire. Ji bo ewlekarîya xwe. Ji bo ku gerîla nikaribe di nav daran ra êrîş bike. Nezanîn û zêdebûna gelheya mirovan jî dihêle ku daristan kêm bibin. Em bi van hewil û helwestan, dahatîya nifşên nû tarî dikin. Lewra li hember Tirkîyeyê, artêşa wê û nokerên wan yên kurd, divê hewildanên pir xurt hebin. Şûna darbirînê em welatê xwe bi daran dagirin. Em nehêlin ku bosteka axa me jî bê dar bimîne.

Li herêmên çîyayî yên Kurdistanê, di her salekî demsala payîzê da heke her kurdek xwedî hişmendîya jîngehparêz be, dikare bi sedan berûyan têxe binê axê.

Berûya te xiste binê axê, êdî ew xwe bi xwe zîl dide û mezin dibe. Ji bo wê tu xizmetekî din nayê xwestin.

Van salên dawî dîmenê birîna daran pir derketin ser dîmenderan. Bi tractor û kamyonan çawa zengînîya me tê dizîn her kes dibîne. Lewra her kesê ku xwe wekî welatparêz pênase dike, divê xwedî çalakîyên baş be ku em karibin pêşî vê xirabkarîyê bigirin. Daku koçberî çênebe û gund û gelîyên me her şîn û xweşik bimînin.

Çolkirin jî mîna darbirînê ye. Ji bo çandinîyê daristan ji kokê tên rakirin. Ji bo kanên madenan û keviran xweza tê çolkirin. Qutkirina ava çeman, lêkirina bendavan hin deverên rûyê erdê çol dike. Koçbertî dest pê dike û li metropolan girse tê ser hev. Êdî civak jî ji civakîbûna xwe derdikeve. Ev rewş gelo dê heta kengî bidome?

## Germahîya Zêde

Formul besît e. Germahîya zêde dişewitîne, zuha dike, diçikîne. Sarmaya zêde Dicemidîne, naherikîne, di dawîyê da dike qeşa. Di her du rewşan da jî li ser rûyê erdî zîndewer, giyanewer namînin. Germahî dê çi bike? Dê rûyê erdî bike mîna ya Heyvê. Mars jî di pergala rojê da ye. Mîna dinyaya me. Lê li ser rûyê Marsê zîndewer tune ne. Çima? Ji ber ku nêzî Rojê ye. Germahîya Marsê zêde ye. Heke em naxwazin mîna Marsê li Dinyaya me were, divê di asta dinyayê da em bêhtir daran biçînin.

Tevî pêşîlêgirtinan germahî zêde dibe. Divê em jî wekî welatparêzekî Kurdistanê, herêm bi herêm pêşî li xirabkarîyan bigirin. Di destpêkê da jîyana civakî li Kurdistanê pişkivî. Niha jî jîyana herî bedew li Kurdistanê tê jîyîn. Lewra divê em nivîsarên Rêber Apoyî kite bi kite bixwînin. Di derbarê jîngehê da, serwextî rewşa xirab bibin. Wê demê em dê karibin pêşîya rûxandina xwezaya Kurdistanê bigirin. Jîngeheka li ser bi awayekî baş tê jîyîn bi pêş bixin.

## Şewatindina Daristanan

Ez dê şewitandina daristanan şîrove bikim lê mixabin, li bakurê Kurdistanê sala 1992an heta sala 1995an 4 hezar gund hatin şewitandin. Kêm yan zêde 5 milyon mirov ji gundan der kirin. Li Kurdistanê ji bilî şewitandina daristanan, rewşeka pir bi dilêş heye.

Pirtûkên ku ji hêla nivîskarên kurd yên dilpak ve hatine nivîsandin hene. Di pirtûkan da bi belge tê nîşandan ku ji sala 1806an ve rewşa kurdan ev e: Şewitandina gund û daristanan, penabertî û kuştin û darvekirin e. Lewra berîya ku ez qala şewitandina daristanan bikim, divê ez qala rewşa kurdan bikim, lê ne mijara vê nivîsê ye.

Tê zanîn, li bakurê Kurdistanê, sala 1990î û şûnda, şerê gerîla berbelav bû. Di vê salê û şûnda, bi awayê bi berdewam, li bakurê Kurdistanê û li başûrê Kurdistanê, daristanan didin ber agir. Çima? Ji wan dijminê kirêt be, heke daristan nebe, gerîla nikare tev bigere. Heke tev jî gerîya dê bi rêya teknîkê bê dîtin. Lê ev yek ne rast e. Ji ber ku li bakurê Kurdistanê zozan jî hene û heta vê gavê gerîla lê dimîne. Dîsa jî her çi be mafê Tirkîyeyê tune ye ku daristanên kurdan bide ber agir.

Ji hêla kurdên welatparêz û rêxistinên wan ve jî wekî tê xwestin, bi awayekî çalak li ser vê mijarê nayê sekinandin. Her herêma ku artêşa tirkan şewatê derdixe, nahêle ku girseyên gel xwe pêgînin û agir vemirînin. Di vî warî da divê çalakîyên cihêreng hebin ku pêşîya kiryarên dewletê were girtin.

Tirkîye ne di destê tirkên welathez da ye. Tirkîye ji damezirandina xwe ve heta niha di destê olîgark û dijminê Anatolya û bakurê Kurdistanê da ye. Zengîn, burokrat, mafya û sîyasetmedarên tirkan; ji bo qezenca zêde daristanan dişewitînin. Li beravan, cihê ku dixwazin awahîyan lê bikin û ji geştyaran ra vekin, destpêkê didin ber agir. Paşê jî avahî û geştgehan lê dikin. Çima? Ji bo pêşîgirtina nerazîbûnan. Ji bo deverên ku maden lê heye jî heman tiştî dikin. Daristanê dişewitînin û dibêjin ku jixwe daristan nemaye. Lewra em dikarin madenan derxin. Sê alîyê Tirkîyeyê bi deryayan ve pêçayî ye. Deverên xweş û jîngehên baş lê hene. Sermayedar ji bo qezenca xwe van deveran bi lêkirin û bi betonê dadigirin. Gelo encam çi ye? Koçberî, vêrana jîngehê, ji bo kesên xwedî sermaye jî jîngehek xapînok tê pêşxistin.

Li ser asta dinyayê, her sal û bê navber agir bi daristanan dikeve. Ji sedeman ra yek jî xwezayî ye. Bitaybet di dema lêdana biruskan da agir bi daristanan dikeve. Germahîya zêde jî dibe sedem ku agir bi daristanan bikeve û hwd. Lê ya ku bi destê mirovan dibe zêdetir e. Sedemên xwe gelek in. Mirovê ne şîyar ku daristanê naparêze, tevî ku sûdê jî jê digire dibe sedem ku agir bi daristanan bikeve.

Encamên rûxîner yê şewata daristanan gelek in. Di serî da tendirustîya mirovan têk diçe. Yên nexweş zêdetir jê bandor dibin. Yên ne nexweş bin jî jê bandor dibin û nexweş dikevin. Hevsengîya xwezayê namîne. Ajalên ku

di daristanan da dijîn ya koç dikin yan jî tune dibin. Hewa tê qirêjkirin. Tebeqa ozonê zirar dibîne û hwd.

Bi vî awayî, mirov demkî yan jî mayînde, ji cih û warên xwe bar dikin û diçin xerîbîyê.

## Zuhakirina Çeman

Ev mijar di heman demê da girêdayî rewşa avhewa û jîngehê ye. Divê were zanîn, em nikarin dinyayeka nû çêkin. Em nikarin hevsengîya rewşedar ya gerdûnê bînin ser hev. Em nikarin baranê bibarînin. Em nikarin ava şêrîn peyda bikin. Em nikarin wekî çemên xwezayî çeman çêkin. Ev yek ne di destê mirovan da ye. Lewra her tişta heyî divê bi awayekî baş were parastin.

Dinya her ku diçe zêdetir germ dibe. Ji bo pêşîlêgirtinan sîyasetek di asta dinyayê da tune ye. Lewra rewş pir lezgîn e. Di serî da divê gelheya dinyayê kêm bibe. Her tiştê ku pergala atfosferê xera dike, divê were terikandin. Ev jî tê wateya ku -di serî da pîşesazî- gelek hilberîn bi temamî jîngehparêz be. Gelo dibe ku tiştekî wisa were kirin? Dema em pergala dinyayê û rewşa dewletan dinêrin, pêşîlêgirtin nayê kirin. Nexwe her ku çû jîngeh dê xirabkar be. Mixabin rastîya ku di merîyetê da ye ev e.

Em berê xwe bidin. Jîyan di avê da dest pê kirîye. Civakîbûn li hemû deverên dinyayê, di gelî û kêleka çeman da dest pê kirîye. Lewra ji bo jîyana mirovan û zîndeweran tev, gelî û çem girîng in. Mirov çi bi çeman dike? Bi rêbazên cur bi cur her ku diçe çem tên çikandin. Li ser asta dinyayê çem yan bi yekcarî diçikin yan jî ava wan kêm dibe. Bajarên bi milyonan jî avên çeman gemar dikin. Ji ber avrêjên bajaran diçin ser çeman. Ji van çeman jî av tê kişandin û baxçe tên danîn. Di encamê da, keskahîya ku em dixwin jî dagirtîye bi tiştên ku zirarê dide tendirustîya mirovan.

Lewra tê gotin ku şer êdî dê li ser avê were kirin. Ji ber ku jêderên dinyayê têra xwedîkirina mirovan nakin. Di serî da jî av. Di dahatîyê da mirov dê ji bo ava şêrîn hev û du bixwin. Ev rastîyek e. Ji ber vê rastîya ku dê pir wêranker be divê niha da pêşî lê were girtin. Yanî dahatîyê da qasî şerên ku me ji bo parastina axa xwe kirine, dibe ku vê carê em ji bo parastina ava xwe bikin.

Li Kurdistanê gelek gelî û newal hene. Welatê me xwedî gelek çemên xuşexuş diherikin e. Kanîyên me jîyana me ne. Li dora kanî û çemên me gelek şaristanî hatine avakirin. Ev xwezaya herî bedew ya dinyayê, xwezayê bexşî me kirîye. Bav û kalan ev xweza parastine. Divê em jî biparêzin û ji nifşê dahatîyê ra bihêlin. Lê li ser erdê me dagirker hene.

Çemên me li bakurê Kurdistanê tên der. Ji wir jî diherikin ber bi jêr ve. Serê kanîyan û çeman, dewleta tirkan girtîye. Bi dehan salan e, Tirkîye li hember Sûrîye û Îraqê kerta avê bikar tîne. Îran jî heman nêzikbûnê dike. Bi taybet li ser Çema Sîrwanê.

Bi hezaran salan e, sefer li ser Kurdistanê çêdibin. Ji ber girîngîya jeositratejîk û jeopolîtîk. Wekî din Kurdistan bi xêr û beran dagirtî ye. Hem ser erd hem jî bin erdê Kurdistanê pir zengîn e. Lewra jî dibe armanca hêzên xwedî armanca hegemonya. Ji bakur, başûr; ji rojhilat û ji rojava ve her tim dagirker hatine û xwestine Kurdistanê bixin bin bandora xwe. Niha û pê da jî çêdibe ji bo çem û kanîyan sefer li ser Kurdistanê were kirin. Di

serî da çemên Dîjle û Firat gelek çemên me hene. Ji bakur ber bi başûr ve diherikin.

Ev rastîya destnîşankirî dê bibe sedema 2 tiştan.

1) Her ku çem zuha bûn yan jî ava wan kêm bû, gundên li der û dor dê neçar bimînin ku cih û warê xwe biterikînin.
2) Ev çem û kanîyên me dê di navbera dewletan da bibe sedema şeran. Di vê rewşê da jî dîsa kurd dê perîşan bibin û berê xwe bidin xerîbîyê.

Lewra di niha da divê sîyaseteka me ya netewî hebe. Hebe ku em karibin pêşî li van kiryaran bigirin.

## Lêkirina Bendavan

Bi hezaran sal in, di asta dinyayê da bendav têne lêkirin. Di destpêkê da her çiqas hejmara bendavan kêm be jî di roja me da bi deh hezaran bendavên biçûk û mezin hene. Li gorî hin lêkolînan her roj bendavên nû dikevin merîyetê û ceyranê hildiberînin.

Tişta mirov şaş û metel dihêle ev e ku gelek lêkolîn, nivîs, pirtûk, documenter û hwd li ser bendavan tên parve kirin. Tevî vê jî pêşîlêgirtinek ber bi çav tune ye. Di navbera teorî û kiryaran da cudahîyek mezin heye. Di navbera zanist û sîyaseta dewletan da dîsa cudahî pir zêde ye. Rewş dişibe kesek ku malevanîyê nizanibe û xwe biavêje nav aveka xurt. Dawîyê da dê bixeniqe û bimire. Rewşa mirovahîyê tev her wisa ye. Tê zanîn di dawîyê da dê çi bibe lê belê dîsa jî rojane bendavên nû dikevin merîyetê. Gelo dawî dê çawa be?

Di lêkirin û avakirina bendavan da Tirkîye zêdegavîyan dike. Ji salên 1970ê heta niha Tirkîye li bakurê Kurdistanê bendavên mezin, navîn û biçûk lê dike. Tu sûdeka van bendavan ji bo kurdan nîne. Ji bo hilberîna elektirîkê û avdana erdan, bendav tên lêkirin. Gelîyên ku bi deh hezaran salan pêşîyên kurdan lê jîyane di bin ava bendavan da têne hiştin. Dîrok û bîrdanka kurdan bi vî awayî tê jêbirin. Ev gelîyên jîyanê ku bi hezaran gund lê ne, di bin avê da tên hiştin. Gundî ji bo cihên din tên veguhestin. Jîyana kurdan a xwerû kominal tê têkbirin. Kurdên ku konê xwe ji gund radikin û berê xwe didin bajaran, bi pirsgirêkên civakî û derûnî ra rû bi rû dibin.

Ev têkçûna civakî digihê wê astê ku taybet ciwan berê xwe didin xwekuştinê.

Îran jî taybet li ser Çemê Sîrwan bendav lê kirîye. Îran jî heman wekî Tirkîyeyê, hem li ser kurdan sîyaset dike hem jî li ser Îraqê. Tevî vê dibe sedem ku bi sedan gund vala bibin û bi deh hezaran kurd koçber bibin. Ev demekî dirêj e di navbera Sûrîye û Tirkîye, di navbera Tirkîye û Îraq, di navbera Îran û Îraqê da pirsgirêk tên jîyîn. Her çiqas welat yê kurdan e jî ji ber dagirkerîya wan çar dewletan, kurd nikarin li ser çemên xwe xwedî gotin bin.

Li ser encamên nebaş yên avakirina bendavan gelek dane hene. Ez dê li vê derê yek bi yek bi rêz nekim. Bendav berê kurdan didin koçberîyê. Jîngeha Kurdistanê tê tunekirin. Dîroka kurdan di bin avê da tê hiştin. Lewra pêdivîyekî lezgîn e ku hewildan û pêngavên pir ji dil hebin.

## Divê Çi Bê Kirin

a) Gorî şîroveya mamoste Rêşadê Sorgulî, têgiha kom resen kurdî ye. Ev têgih di asta dinyayê da berbelav e. Di gelek zimanan da tê bikaranîn. Peyva "min" jî jixwe kurdî ye. Lewra wateya **komin**; koma min e. Di komên mirovan da min yan jî ez hişmendîyeka bingehîn e. Bi vê hişmendîyê komên mirovan xwe parastî ye. Bi vê xwe bi pêş xistîye. Ji destpêka dîrokê bigire heta îroj, komin bingeha civakîbûnê ye. Her ku komên mirovan ji vê yekê dur ketin, ji civakîbûnê ketin. Ji hêla din ve jî herdemî kom hene ku kominê diparêzin. Nahêlin ku civakîbûn ji holê rabe. Divê serdema nû ya Kurdistan, Rojhilata Navîn û di dinyayê da, komin bingeha hemû şaxên civakê be. Daku em karibin vegerin li ser civakîbûna hemdem. Ji bo pêşîlêgirtina penabertî û koçberîyê ev yek pêdivîyekî jêveneger e.

b) Felsefe girîng e. Bi têgehekî din Think Tank (sînk tenk) girîng e. Di serî da DYA, di gelek welatan da sazîyên think tank hene. Li Rojhilata Navîn û li Kurdistanê jî think tank hene. Li Tirkîyeyê wekî înstîtu sazî hene. Li çar alîyên Kurdistanê û dervayî welat jî sazîyên think tank hene. Li Tirkîyeyê sazî û înstutîyên ku hene, bi salixgirîya Tirkîyeyê ve girêdayî ne. Sazî yan jî înstutîyên serbixwe, li Tirkîyeyê bi taybet di dema desthilatîya AKPê da, ji holê hatin rakirin. Lewra li ser asta Tirkîyeyê korfahmîyekî mezin heye.

Di warê felsefeyê da Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd gavên mezin avêtin. Dê û bavên kurdan, dema ser mijarekî diaxivin, em dibînin ku bi hişmendîyeka pêşketî diaxivin. Dema hin kesên tirk bi etîketên prof. akademîsyen û hwd diaxivin, nezanîn û cehaleteka mezin di wan da heye. Kurdan li çîya û banîyan, li deşt û gundan, li bajaran, dervayî welat; gelek akademî û sazî bi pêş xistine. Bê navber perwerde dibînin. Di cihekî da heke çend têkoşerên kurd werin gel hev û du, mijara wan galgalên felsefeyî ne. Mîna kominê jixweber yê think tank, bi hev dişêwirin. Ev astek baş e.

Divê em hewil bidin ku dijî sazîyên dewletan yên think tank, sazîyên, kom û kominên think tank yên civakî zêdetir bi pêş bixin. Ji ber ku mejîyê mirovan jî mîna zikê wan e. Divê rojane were têrkirin.

c) Ji bo ku penabertî çênebe, divê şerê dewletan û desthilatan çênebe. Ev jî bi pêşxistin û parastina *Aştî û Civaka Demokratîk* pêkan e. Li ser asta dinyayê dijî şerên hegemonyayê bi sed milyonan mirov dikarin dijitî bikin. Dikarin çalakîyên cihêreng lidarbixin. Ji ber ku hêzên hegemon, gel didin pişt xwe, zemînekî rewa çêdikin, paşê dest bi şer dikin. Heke pêşîlêgirtinek baş hebe, ew hêzana nikarin vê yekê bikin.

d) Ji bo filaketên xwezayî çênebe divê kar were kirin. Heke filaket û bûyerên xwezayî çêbibin jî ji berê da mirov dikare pêşî lê bigire. Di encamê da

koçberîya ku xwe dispêre filaketên xwezayî,
dikare dakeve aste herî jêr.

## Belgeyên ku ji wan sûd hatîye wergirtin


- Rêber Evdellah Ocalan: Parêzname û Dahûrînên Wî.
- Kelimullah Tewehudi: Kürdlerin Horasan’a Göç Tarihi, birinci cilt, Farsçadan çeviren: Muhsin Özdemir.
- Zeki Ozmen: Kurdên Almanyayê.
- Wîkîpedîa.
- Mejîyê Çêkirî
- Selîm Temo: Horasan Kurtlerî
- N. A. Xalfîn: Di Sedsala 19em Da Rewşa Kurdan.
- Şoreş Reşî: Dîroka Canbegan

[i]

---

[i] Di nav gengeşe, coş û peroşa şoreşa rojavayê Kurdistanê da, min karî vê pirtûkçeyê sergihayî bikim. Ez cîhaneka wisa dixwazim ku ne kurd ne jî miletek din, tu caran neçarî penapertîyê nebe. Em dê bi hev ra têkoşîna vê yekê bikin. Her kesê ku ev pirtûkçe xwendibe, hûn her hebin. Herdem serkeftî bin.

Malperên min:

KEYE - AZADWEJE.COM

KINÊR